

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 74 | 2019



bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 74 | 2019

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Adem Özgür, Arvîn Berchemî, Amed Tigrîs,
Bêrvan Keskin, Seyfi Doğan, Hızır Akbina, Nuh Ateş,
Mem Xelikan, Muzaffer Özgür, Mehtab İdeli,
Perin M. Esmeroglu, İbrahim Korkmaz, Mûlla Evindar,
Xizan Şilan, Dr Mikailî, Yıldız Karagöz, Zekî Ozmen

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apetryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Bîrnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK — Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro—Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baski: Apec—Tryck AB



Komkujîya Helebçeyê

Wêneyên bergê:

Koçberî û êş, Selahaddînê Eyyûbî
ji firçeya Nuh Ateş

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn,
serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwediyar
nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

- Ji bîrnebûnê 4
Alî Çiftçi
- Rêwîtiya dirêj û bi êş 6
Muzaffer Özgür
- Îskana kurdan li Anatoliyê 9
Dr Mikailî
- Kîtêbeka welatê xeribîyê: *Rû û Kûr* 29
Adem Özgür
- Bêhna bêrîkirinê 34
Arvin Berchemî
- Zozan bêbask ma 37
Yıldız Karagöz
- Helbest 42
Bêrivan Keskin
- Gotinên çê 43
Nuh Ateş
- Şivan 49
Mûlla Evîndar
- Agirê vejîne 59
Xizan Şilan
- Jîyan jan e 60
Mem Xelîkan
- 61 "Hesp çêkir"
Mûlla Evîndar
- 63 Ji bo bîranîna komkujîya Helebçê
İbrahim Korkmaz
- 64 Pêkenok
Hizir Akbina
- 65 Quto
Seyfi Dogan
- 67 Mon amour Xelika
Seyfi Dogan
- 68 Îsak
Seyfi Dogan
- 69 Çend peyv û gotinên me - 1
Mehtab İdelî
- 80 Çend başî û şaşiyên
Rêbera Rastnivîsînê
Amed Tigris
- 83 Li bajarê Giessenê danasîna
romana Dr. Fikret Yıldiz
Zekî Ozmen
- 85 Li benda keskesorê
Perin M. Esmeroglu

Ji bîrnebûnê

Hilbijartinên şaredariyan li seranserê Turkiyê û li bakurê Kurdistanê di 31ê adarê de çêbûn.

AKP, ji 2002an ve ku desthilatdariya Turkiyê girtiye destê xwe. Di van du hilbijartinên dawî da bi hevbendîya partiya neteweperest MHPê dîsa karibû ji %51dengên werbigirê. Di vê hilbijartinê de AKPê li Îzmir, İstanbul û Ankarayê nikaribû desthilatdariya şaredariyan werbigirê. Li piraniya şaredariyên bajarên kurdan HDPê karibû bi ser keve. Li Dêrsimê cara yekê ye ku namzedê TKPê, Fatih Mehmet Maçoğlu bû serokê şaredariyê.

Li bajarên Kurdistanê her çiqas zor-darî û bêdeletî hebû jî hilbijêrên kurd piranî dengên xwe ji bo nasnameya xwe dan! Di nav kurdên Anatoliya Navîn de jî tendeseka weng çêbûye.

LI PIRANIYA WELATÊN EWROPAYÊ di hilbijartinên îsal de partiyên nîjadperest-populîst dengên xwe zêde kirin. Yek ji sedemên pêşketina van partîyan ev e; ji Rojhilata Navîn koçberîyeka girseyî di van deh salên dawî de çêbû. Bi hatina van koçberan pîrsa bi cî û war bûyîn, kar peyda kirin û entegrebûyîne de pîrsgirêkên mezin bi xwe re anîn. Ev partiyên nîjadperest van pîrsgirêkan ji bo propaganda xwe bi kar tînin. Sebeba piraniya van pîrsgirêkên entegrebûyîne

jî hem ji aliyê welatên ku koçberan werdigrên û hem jî ji aliyê koçberan bi xwe ve derdikevine holê.

Ew welatên ku piraniya koçberan wergirtine divê kanûn, nîzam û destûrên xwe bo herkesî bi kar bînin. Koçberên ku tîne Ewropayê jî divê li gor destûra van welatan tevbigirin.

Şer û bêdeletiya ku li wan welatên ji aliyê aborî, zanist û teknîkê de paşde mane hêdî nikarin pîrsgirêkên hemwelatîyên xwe çareser bikin û ev jî dibe sebeb ku însan li cî û warên nû bigerin bo pêşeroja xwe!

Niha li seranserê welatên Ewropayê pîrçandî û pîrzimanî rastîyek e. Pîrrengîyêke derketîye holê. Wê jî bi xwe re bixwaze an nexwaze hinek pîrsgirêk anîne.

Yek ji mafên hemwelatîyên welatên Ewropayê ya bîngêhîn mafê nasname û azadîyê ye. Helbet ev nê wê manê ku kî çi bixwaze li gor dilê xwe dikare bike!

Mafê herkesî heye ku nasnameya xwe, ziman û çanda xwe bizane û pêş ve bibe. Herwiha ziman û çanda wî welatî ku lê dijî, bizanibe di nav civata pîrçandî de cîyê xwe bigirê û entegre bibe.

Ji wan koçberên ku van salên dawî hatine û li welatên Ewropayê belavbûne, hinek ji wan bi navê dîn û bawermendîyê xwe bi rêxistinî kirine

û dixwazin li gor bîrûbaweriyên xwe li nav van koçberan sîyaset û propan-da xwe berdeyam bikin. Ev jî rê li ber entegrebûna koçberan digirê û herwiha dibe sebabên pirsgirêkan. Bîrûbawermendî tîştêkî pir şexsî ye! Li welatên pêşketî kes nikare bîrûbawermendîya xwe li ser yekî din ferz bike!

Li van welatên Ewropayê ji bo me kurdan pir îmkân û derfet hene ku em bikaribin hem zimanê xwe fêr bibin û hem jî nasnameya xwe bizanibin û di nav vê civata pirrengî de ciyê xwe yê rast bigirên bê ku bikevin bin tesîra hinekên din wek, ereb, fars û tirk!

HEZKIRÊN KOVARA BÎRNEBÛNÊ, di vê hejmarê de dîsan nivîsên lêkolînî, belge-name, çîrok, serpêhatî, pekenokî û folklorîk hene. Ji van hinek:

Muzaffer Özgür, bi sernivîsa *Rêwîtiya dirêj û bi êş*, li ser cîvîna hevkarên Bîrnebûnê ya îsal û galaya belgefilmê *Hevalê bargiran-Dr. Nebî Kesen* nivîsiye.

Dr Mîkailî ji arşîva Serokwezera Tirkîyê (*T.C. Başbakanlık Arşivleri Genel Müdürlüğü*) derheqê Îskana kudan li Anatoliyê belge-name peyda kirine û herwiha bi şiroveyeka xwe, hinek ji van belge-nameyana ji zimanê osmanî daye wergerandin û li gel çend orijînalên belge-nameya bi sernivîsa *Îskana kurdan li Anatoliyê* amade kiriye.

Tîştê herî balkêş ê van belge-nameyên ji arşîva Turkîyê ev e; bi tarîx

em niha dizanin ku kengê kurdên me hatine Anatoliyayê.

Adem Özgür, hevpeyvînek bi Ali Duran Topuz re li ser kitêba wî ya bi navî *Rû û kûr* ku bi devoka Qoçgîriyê hatiye nivîsandin, kiriye.

Arvîn Berchemî, bi navê *Bêhma bêrikirênê* kurteçîrokek, Yıldız Karagözê bi navê *Zozan bêbask ma*, Berîvan Keskinê du helbest, Nuh Ateş bi berdeyamîya *Gotinên çê*, Mulla Evîndar du çîrok, yek bi navê *Şivan*, ya din bi navê *Hesp çêkir*, Hizir Akbîna *pêkenok*, Seyfê Dogan li gel sê helbesta bi navê *Quto şeweya şîra Haîku* ya japonî şirove kiriye.

Mehtap Îdelî bi sernivîsa *Çend peyv û gotinên me* ferhengokek amade kiriye. Me heta herfa Şyê di vê hejmarê de belav kiriye. Berdeyamîya fergengokê dê di hejmara bê de bê weşandin. Di vê ferhengokê de pir gotinên ku li ber windabûyînê ne hatine berhev kirin.

Amed Tîgrîs kitêba *Rêbera Rast-nivîsînê* ya Komxebata Kurmançiyê bi çend başî û şaşiyên vê şirove kiriye. Zekî Ozmen û Perin M Esmeroglu yê kitêba *Li benda keskesorê* dane nasandin. Perin M. Esmeroglu li vê kitêbê hûr û kûr bûye û bi zimanekî xweş naveroka kitêbê daye nasandin.

Bi hêviya havîneka xweş, bimînin di xêr û xweşiyê de heta hejmara bê!

Ali Çiftçi

Rêwîtiya dirêj û bi êş

Muzaffer Özgür

Edîtor û hevkarên redaksiyona kovara Bîrnebûnê hersal carekê ji bo çend rojan tên cem hev û kar û barê xwe amade dikin. Civîna me ya îsal, sala 2019 an ji bo ku teve galaya bêlgefilmê **Hevalê Bar Giran – Dr. Nebî Kesen** bibin me civîne xwe di rojên 26– 28 nîsanê de li Hamburgê plan kir. Ji bo ku beşdarîya civîn û gala belgêfilm amadekarîyên me serê salê de destpêkiribû.

Rêwîtiya me ji sê welatan, rojja 26 ê nîsanê destpêkir. Kek Ali Çiftçi û Seyfî Dogan ji Swêdê, niviskara me ya hêja Mehtab Îdelfî ji Swîsre hatin bajarê Hamburgê.

Kek Nuh Ateş, emekdara me Ayşegül Kısabacak ji Mainzê û kek Vahit Duran Wetzlarê û kek

Mustafa Mih û Osman Gündoğdu (dost û piştgirê kovarê) ji Berlinê, ez ji Kölnê û kek Dr. Fikret Yildiz jî ji Duisburg hatin.

Em li otêlê, hatin ba hev. Şabûn û serfirazîya hevalan di ronîya çavên wanan de dibirikî. E me got! Ked û karê 22 salan li paş xwe hîştibûn. Çend havalên din jî daxwazkiribûn ku werin civînê lê ji ber hinek astengîyan nekanîbûn werin. Me dizanî ku dilê wanan bi me ra ye.

Êvarê, kek Mehmet Behzatoğlu, Bilal Yildirim û Îsa Kesen jî teva koma me bûn. Me kûr, dûr û dirêj sohbet kir. Kek Memo bi dil û can em kirin mêvan. Em jî bi hevûdîtina wan kefxwaş bûn.

Roja 27ê nîsanê me li buroya kek Memet Behzatoğlu civîna



Dîmenek ji civîna edîtor û hevkarên redaksiyona kovara Bîrnebûnê


xwe bi rêvabir. Mala wî ava be, kek Memo her tiştekek; xwarin, vexwarin û buroya xwe ji bo civînê amade kiribû. Me di civînê de li ser gelek mijaran sohbet kir û kar o barê xwe yê pêşerojê plan kir. Bi he nek, stran, ken em gehiştin dawîya civîna xwe.

Dûre em rabûn ketin rêya cîyê ku dokumenter filmê li ser Nebî bi-hata nîşandan.-şanoya Mûtê-.

Hevalê Bar Giran – Dr. Nebî Kesen, 11.9.2012 bi krîza dil ji niş-kava, êvarekê em di nav êş û girî de hiştin û ji nav me koçkir çû.

Bê xatirxastina wî em demekê gi-ran di nav êşan de man, lê jîyan usa bû!

Birayê kek Nebî, Îsa daxwaz kir ku ji bo bîranîn, jîyana wî û kar û barê wî neyê jibirkirin belgefilmekî



amade bike. Li dawîya 2-3 salan bi-ser jî ket.

Derhêner Mehmet Ali Baran bi alîkariya malbat, hevalên Nebî û kovara me Bîrnebûnê karê xwe bi serkeftin xelas kiribû. Gelek însan beşdarîya belgefilmê bûn.



Lawê Nebî Sherko Kesen, Enver Kesen. Îsa Kesen, derhêner Mehmet Ali Baran. Muzaffer Özgür, Vahit Duran. Hasan Kesen û İsmail Kesen.



Derhêner Mehmet Ali Baran, Mehmet Tanriverdi û Vahit Duran

Pismamên kek Nebî (Hasan û Enver) bi malbatên xwe ve ji Danêmerk hatibûn. Dayika kek Nebî bi êşa giran, çavên şil li rêza pêş rûniştibû. Ji bo dîlziya xwe ez çûm ba û min destên wê paç kirin.

Ez kelegirî bûm. Kek Vahit Duran bername bi rêva bir. Enver Kesen jî bi navê malbata Nebî mêvan silav kirin. Murat Bay û Wilfrid Puhl li ser dîkê çend stran gotin.

Hestirk bûn ava çemê firatê. Li dawîyê, ji mevana birêz Mehmet Tanriverdi (cîgirê serokê Civata Kurd li Almanyayê) bi navê malbata Nebî derhêner Mehmet Ali Baran xelat kir.

Spas ji bo malbata Nebî Kesen, bi taybetî birayê wî, Îsa Kesen ku matî û manevî piştgirîya dokumentera li ser Nebî kirin!


Spas ji bo hevalên ji Bîrnebûnê; Ayşegül Kısabacak, Vahit Duran û A. Hakan Mih!

Rêwîtiya me berdeyam e.

Du kurdên Anatoliyê wek parlamenter ketin meclîsa Danîmarkayê



Halime Oğuz



Lars Aslan Rasmussen

Halime Oğuz ji Konyayê gundê Omera ye û di biçûktiya xwe de hatiye Danîmarkayê. Lars Aslan Rasmussen jî bavê xwe ji kurdên Haymanayê ye û diya wî danîmarkî ye. Em herdu parlamenterên kurd pîroz dikin û serketina wan daxwaza me ye.

Halime Oğuz ji lîsta Socialistisk Folkeparti û Lars Aslan Rasmussen jî ji Partiya Sosyaldemokrat wek parlamenter hatin hilbijartin.

Li gor belge nameyên arşîva serokwezareta Tirkîyê (T.C. Başbakanlık Arşivleri Genel Müdürlüğü)

Îskana kurdan li Anatoliyê

Dr Mikailî

Ew 20 salî zêdetir e, em di kovara Birnebûnê da li ser sedem û tarîxa hatina kurdan a Anatolya Navîn dinivîsin, lêdikolin û nivîsa belav-dikin.

Piranîya wa belge nameyana ji lêkolinvanên tirk, osmanî yan jî ji gerok û lêkolinvanên û ewropî ne.

Bi derketina medya sosyal û internetê ew lêgerîn û lêpîrsîn hîn

jî bi lez bû û avakî nû hilgirt. Pîr tiştên ku me jî nedizanîn û haya me jê tunne bûn, di wir da tîn weşandinê.

Ew zanînen di vir da jî pir caran çewt û şaş in, hewcedariya hîlbijartinê ne. Lazim e em wana di bêjîngê da derbas kin û dû ra pê bawer bin û biweşînin. Lê dîsa jî heta nika tarîxa hatina me şewlî mawû,



Vilayeta Ankarayê, 1907

zelal nebû bû. Gelo çima? Ji ber çî ew eşkere nedibû? Kê pêşî li vê girtî bû? Yan jî me nedikarî xwe bigîhîjinîn ew zanistiyana, agahîyana?

Gotinek mezina heye, diwê; ku wext nehat, tiştik nabe!

Erê, me pê dizanî yan jî tehmîn dikir ku di arşîv û odayên tarî û nedihat zanîn ya devletê da di derheqa me da, ew koma bi sedhezaran, milyonan de hîn tişt veşartî bin, yan jî çî belge, nivîs, destnivîs hene ji holê hatine rakirin.

Lê derfeteka kete destî me, ra me da ku, devletên mezin û kevn pirr cara tiştêkî navêjin û wenda nakin!

Tenê di destî xwe da digrên, vedişêrîn û ku wext, dem hat eşkere dikin, ji kesên wek me ra jî vedikin.

Dereng jî be, nika di derheqa hatina me da hendu hertişt zelal bûn.

Hûn ê niha bipîrsin gelo çî bû, çî qewimî ku, ew nika bû?

Guhê me hertim ji bo vê pîrsgîrêkê vekirî bûn. Di nav internetê da em rastî hîn kom û kesan hatin, ku bi esl û koka xwe, binyata xwe va pirr mijûl in. Ji wana hîn kesan bala min kişandin ser belgenamêyên “*Başbakanlık Arşivleri Genel Müdürlüğü*”.

Li ser vê ez ketim wê arşîvê. Ew wek derya bû, xezine bû ji bo me.

Wek minak;

Te peyva rişvan, cihanbeyli yan jî mikaili dida wan û di vê malperê da çîqas belgenome di derheqa wana da, di dema osmanîya û Komara Tirkîyê da hene, dida me.

Wana orijinala vê belgeyê wek wêne/resim kirine wir û li ser jî bi kurtî, kinî çî di tê da heye, le ser çî ye, nivîsandibûn. Me bi vê riyê qasi 200 rûpel ji arşîvê kirrî û daxist ser komputera xwe. Lê pîrsgîrêkek nû derket ber me!

Tenê kurtenasandina wan belgeyena bi tirkîya nû, bi herfên latînî hatibûn nivîsandinê. Belge bi xwe bi herf û elfebeya osmanî bû.

Gelo kî yê vana ji tirkîya osmanî bizivrînda tirkîya Latînî?

Em bi mehan lê geryan, ji dost û hevalan pîrs kir, ji çend kesan ra wek mînak hîn rupel şandin. Lê ew bê encam man. Ên ku digotin; baş e, em ê bikin, nekarîn. Ji ber ku osmanî zimanekî tevlihev e! Ji erebî, farsî, kurdî, tirkî û hîn çend zimanên balkanî çêbûyî.

Li qederê mêze kin, kesên ku *Bîrnebûnê* ji sêrî da heta nika dixwînin û dişopînin yê rind nas bikin, bizanin; lêkolinvanê herî

kevn ê kurdên Anatolya Navîn birêz rehmetî Osman Alabay bû. Canbegekî ji gundî Sînayê Şuşê (Sinanli) bû. Di kovarê da wek Curukî pir nivisên wî hatin weşandinê.

Keçika wî pispora zimanî farsi, osmanî, erebî, kurdî û tirkî bû.

Me xwe gihand wê û jê rica kir. Xwadê jê razî, wê dilê me neşikêand, lê soz jî neda ku ew ê baş bizivîne yan na! Ji berku ew karekî bi vî avayî qe nekiri bû. Lê me wek numune çend rûpel ji zimanî osmanî ji wê ra şandin. Û wê ji me ra zivirand, tercûme kir û dîsa şand.

Bi rastî tenê çend navên taybet yên gund, bajar, kesayet an jî êla, nekanî bû, ji xencî wana ew bi serkevtî bû.

Em ê di vir da çend tiştên ku wê heta nika ji me ra tercûme kirine, pêşkeşî we bikin. Lê karê mezin hîn amade dibe. Ku ew qedîya, xelas bû em ê giştika bi hev ra wek kitêbekê bidin çapê. Ez omidwar im ku bi vê jî çîroka lêgerîna koka me hendi zelal dibe. Hendi çîrok û dîtînen xeyalî, yan jî şaş ji holê radibin.

Ji va belgenamêyana ya herî kevn ku qala sirgûn û îskana me dike, di sala 1692an da hatiya nivîsandin.

Di vir da padişahî osmaniya ferman ji beg û mirên Diyarbekir û

Rakkayê ra şandiye ku ew kurdên canbegî (Cihanbeyli) û hîn tûrkmenan rakin Rakkayê û li dorberî çemî Feratê bi cîh bikin, ji ber ku ew eşkiyatîyê dikin û nerehetîyê didin gund û bajarên.

Wêngê valiye Diyarbekirê Ali Paşa ye û mutasarrif (mir, sancak begî) jî Rîşvanzade Mehmet Paşa ye. Reşîyan (rişvan) e. Yanê sirgûn û iskana canbegan bi alîkariya begekî kurd, begî Rîşvana dane kirinê.


Ew sirgûn hetanî 1855an dajo. Ew piranî bi destî sultanî osmaniya Sultan Mahmud II (1803– 1839) va hatiye meşandinê.

Sultan Abdulmecid jî ew tamam kiriye.


Sultan Mahmud II bi reformên xwe va tê naskirinê. Wî xwestîye hukumeta navendî xurttir bike û quvveta mîr û began, ayan û voyvodayan kêmbike.

Sultan Mahmud II kurdên ku hatine sirgunkirinê li Konya, Ankara û sancaxa Viranşehirê li dorberî Çerkeşê bi cîh dike. Navende sancaxa Viranşehirê wêngê bajarê Safranbolu ye. (1811– 1870)

Safranbolu wêngê wek Tarakli Borlu tê naskirin û di belgenamêyan da jî wekîna derbas dibe.



1881- 1870 - Xerita sancaxa Viranşehirê



1900 - Sancaxa Bolu

Husrev Paşa û Îbrahîm Paşa ji bo osmanîyan li wir ew kar kirine.

Ew kes û êl bo pir caran ji cîhê ku hatine surgun kirin direvin û di derheqa wana da jî pîrr ferman hene, em ê ji wana yê herî balkêş û zelal ji we ra pêşkeş kin.

Kopya va belgeameyana jî em ê wek numune di vir da biweşînin.

Piştî ku iskana canbegan û êlên bi wan va girêdane, di bin îdara wana da ne, li dorberî Ankara û

Qonyê qediya, xelas bû, îcar jî reşî û êlên bi wan va girêdayîne tèn bicîh kirin, iskan kirin.

Ew iskana Reşîyan jî dîsa bi alîkariya mîrê canbegan Alişan begê û valîyên Ankara û Qonyayê tê meşandin.

Ew êlên kurd ku bi canbegan va hatine surgun kirin ev navana tê da derbas dibin;

Şeyh Bezeni (di arşivê da bi vî avayî hatina binavkirinê, ne weka îro; şeyhbızınlı!).

Di belgeameyan da pir cara navê wana şaş hatine qeydkirin.

Wek numune;

Canbegî: Cihanbeyli,

Hêcibî: Hicvanli, hîcanli, hecvanli

Têrikî: Tûrkanli, tiriganli, tirkkanli

Drêjan: Diricanli, viricanli

Şêxanî, Şêxkî: Şeyhanli, şehanli,

şeyanli, şiganli

Sînanli: stanli

Sêfîkî: Seyfîkanli

Keykilli: Geygelli (türkmen)

Navê hin êla jî di arşivan da qet derbas nabe. Wek; vatmanlı, zeyveli, ziveli

Hin êl îro li Anatolyê hene ku di arşivan da tu navên wan derbas nabin. Weka; zirîkî, rutî, nasîrî, sewêdî, bazîkî, modan.

Lê di belgenomeyan da tişteki din ji bala me kişand; ji kurda ra kurd yanê bi zimanî osmanî, erebî ekrad hatîbû nivisandinê, ne wekî em ji tarixa resmî ya li Tirkîyê heta nika nasdikin, wek tirk û turkman!

Mesela hin êlên turkmena ku bi canbegan va hatine surgun kirin, ji îdara canbegîyan nerazîbûna xwe nişan didin û sultanî osmanîyan wana li Bilecikê bi cîh dike, wek geygela.

Ji ber ku me hîn pirraniya wan belgeyana nedane zivirandinê, tercûme kirinê, em ê kurtenîvîsa wana ya bi tirkîya nû û bi kurdîya kurmancî li jêr ji bo we rêz kin.

Me bi zanîtî ew navên ku çewt hatina qeydkirin, wek xwe hiştin.

1- Belge Tarihi:

H-10.10.1125/ M- 1709

Belge özeti: *Rakka'da iskan olunan Kürtlerin iskan mahallerini terkedip eşkiyalık yapımlarının önlenmesi.*

Kurdî: Gere pêşî li kurdên ku li Raqqayê hatine iskan kirinê bên girtin ku, bila eşkiyatîyê nekin û disa nerevin derên din.

2- Belge Tarihi:

H-10.07.1130/ M- 1714

Belge özeti: *Çorum ahalisinden gerek veririz, gereksede ekrad, türkmen ver-*

sin diyerek ödemediği imdadı seferiye bakiyelerinin eksiksiz olarak tahsilatı.

Kurdî: Alikariya seferiyê ya mayî hewce ye ji gelê Çorumê bê stendin. Xelkê soz dane ku wê bidin, yan jî dibêjin em nadin bila kurd û tirkman bidin.

3- Belge Tarihi:

H- 25.06.1133/ M- 1717

Belge özeti: *Rakka'ya iskan edilen Cihanbeyli Ekradı cemaatinden ve Umranlı Ekradından birkaç şahıs Malatya sancağına tabi Şureeli kazasında bir köye göçüp haneye taaruz ve mevali gasp ile zarar ıka eylediklerinden ve asari şeriyelerini de vermediklerinden Rakka da cemaatleri arasında iskanları.*

Kurdî: Ji ber ku ji kurdên canbegî û Imranli çûne li Malatya Şureeli û destavêtina mal û milkê xelkê û zirar dane wana, gere ew ji şûna xwe bên rakirin û li Raqqayê bên iskan kirin.

4- Belge Tarihi:

H-29.02.1173, Miladi: 1757

Belge özeti: *Şekavetleriyle halka zarar veren Çorum sancağındaki Ceymeli grubu, Dosno ve Selmanlı Kürd aşiretlerinin Çorum Kürdünden maadasının eski makarları olan*

Kirşehir, Çukurova ve Mecedöz'ünde iskanları hakkında hüküm.

Kurdî: Ji ber ku komên kurdên ceymeli, dosno, selmanli eşkiyatîyê dikin û zirarê didin xelkê, ji sancaxa Çorumê bên rakirin û dîsa bişînin cihê wan a berê ya kevn li Kirşehir, Çukurova û Mecedözüyê.

Ji vê belgenamê jî em jê derdixin, tespît dikin ku kurd sala 1757an da hendi li Anatolya Navîn in.

5- Belge Tarihi:

H- 02.01.1189, Miladi: 1773

Belge özeti: *Ankara, Kengiri (Çankırı), Çorum, Bozok (Yozgat), ve Kayseri sancaklarında bulunan göçebe Türkmen ve Ekrad taifesine nizam verilmesine dair defterdar tavrî.*

Kurdî: Defterên Tavrîyê ya di derheqê nizamdayîna türkmen û kurdên koçber li sancaxên Ankara, Kengiri (Çankırı), Çorum, Bozok (Yozgat) û Kayserîyê da.

6- Belge Tarihi:

H- 10.02.1198, Miladi: 1782

Belge özeti: *Imam Bakırî evladından ve Şeyh Bezenli aşiretinden Es- Seyyid Molla Ahmed ve oğullarının konar göçer olduklarından bahisle Ergene kazasında Kafir dağı*

denilen yerde hayvanlarının otlatılmasına engel olunmaması.

Kurdî: Ji êla şeyhbezenli, evladê Imam Bakırîyan Es-Seyid Molla Ahmed û lawên wî yên ku koçber in, gere rê li ber wana neyê girtin û astengî kirin û bila ew li bajarê Ergenê li cîyayî Kafir keriyên pezî xwe biçêrin.

Jêrenot: Wek em dizanin **İmam Bakır** kesayetekî piroz î musulmanên Şia ye.

Gelo ji şêxbezenîyan hin kes wêngê şia bûn?

Wek em nika pê dizanin, şêxbezenî ji dewera Xanekîn û Kerkukê hatine û wek zarave kurdîyeka nêzikî kelxur û feylîya deng dikin.

7- Belge Tarihi:

H- 13.04.1198, Miladi: 1782

Belge özeti: *Erzurum ve Kars Çıldır taraflarındaki Badilli (Badilî) ve tevabii Cihanbeyli (canbegî), Tacirli ve Pirebadilli aşiretlerinin mukataatının Rakka'ya ilhakı.*

Kurdî: Êlên Badilî û êlên ku tabîyî wana wek canbegîyan, tacirli û pirebadilîyên ji alîyê Erzurum û Çıldira Qersê bên rakirin û mukataata wana li Raqqayê bê bicîhkirin.

8- Belge Tarihi:

H- 10.07.1203, Miladi: 1787

Belge özeti: *Ekraddan Cihanbeyli Aşiretinden Alişan nam şakinin Kengiri (Çankiri) ve çerkeş kazaları ahalilerine vaki olan taaddi ve hasaratı hakkındaki telhis üzerine Rumeli ve Anadolu' da zuhur eden eşkiyanın izalesi.*

Kurdî: Ji ber ku ji êla Cihanbeyli (canbegan), kesî ku bi navî eşkiya Alişan li bajarên Kengiri û Çerkeş zirar ziyar dane xelkê û herweha eşkiyayên ku li Anadolu û Rumeliyê derketine, bên binkontrol kirinê.

9- Belge Tarihi:

H- 29.05.1228, Miladi: 1812

Belge özeti: *Muharebe münasebetiyle Anadolu taraflarına dağılmış olan Tatarların Karasu vadisinde iskanları takarrur eylediğinden Karahisari- i sahib dahilinde Barçınli kazası ve nevahisinde bulunan Tatarlar hareket etmek üzere olmalarıyla Cihanbeyli Aşireti beyi Halil Bey'in Tatarlardan gasbeylediği emval ve eşyalarının veya bedelinin tahsili için Karahisar mutasarrıfına yazılan hüküm.*

Kurdî: Hukma ji Mutassarıfî Karahisar ra hatiya nivîsandin, ji êla canbegan Halil Begê mal û milke teterên ku ji ber şer reviyane û

hatine Anadoluyê li derberî Karasu da iskan bûne, mal milke wan yên ku hatine gasp kirin û dizîne, belâ zirara wan disa bê tehsilkirinê.

10- Belge Tarihi:

H- 29.12.1229, Miladi: 1813

Belge özeti: *Haymanateyn kazasındaki Mikaili, Vatmanli, Sinanlı vesair Kürt aşiretlerinin İstanbul'a koyun sevkiyle meşgul olduklarına ve saireye dair.*

Kurdî: Êlên kurd weka mikailî, vatmanli, sinanlı yê li Heymanê bi şandina pezi ji bo Stenbolê mujil in.

11- Belge Tarihi:

H- 21.04.1230, Miladi: 1814

Belge özeti: *Cihanbeyli Aşireti'nden Alişan Bey'in Haymanateyn kazası sakinlerinden Şeyhbezenli aşiretinden bazı kimselere tecavüzü.*

Kurdî: Tecavuza begî êla canbegan Alişan begê li ser hîn kesên êla şêxbezenliya li bajarî Heymanteynê.

12- Belge tarihi:

H- 29.01.1237, Miladi: 1821

Belge özeti: *Cihanbeyli Aşireti halkı, yaylak resimlerinin ve miriye ağnamlarını aynen verdikten sonra Ankara, Çankırı, Bolu ve Viranşehir*

sancaklarında yaylaya çıktıklarında birşey talep edilmemesi.

Kurdî: Piştî ku êla Canbega, bedela kiraya zozanan dan, ji wan tiştêkî din neyê xwestin û ji wan ra bê musaade kirin ku ew derkevin zozanên Ankara, Çankırı, Bolu û sancaxa Viranşehirê.

13- Belge tarihi:

H- 07.06.1240, Miladi: 1824

Belge özeti: *Cihanbeyli Aşireti'nin vatani asileleri olan Harput'a nakl ve iskanları işinin Tirkanli (Têrikî) usati galesinin definden sonraya taliki hakkında.*

Kurdî: Di derheqa karî disa vegerindana êla canbega ji bo welatî wana ya esil, ji bo Xarpetê, li dû çareserkirina pirsgirêkên diz û eşkiyayên Têrikîya.

14- Belge tarihi:

H- 30.03.1243, Miladi: 1827

Belge özeti: *Cihanbeyli Aşireti beyi Mustafa Bey ile amcası Ömer, aşireti arasına fesad sokarak İstanbul'a gönderilecek koyunlara mani olduklarından Tolcıya sürülmeleri hakkında Karaman Valisi Ali Paşa'ya hüküm.*

Kurdî: Hukma ji bo valîyê Karamanê Ali Paşa di derheqa Sirgu-

na begên canbegan Mustafa û Ömer begê ya bajari Tolci, yên ku fesadi di nav aşiretê da kirine û nehêlane pez ji bo Stenbolê bê şandinê.

15- Belge tarihi:

H- 28.06.1246, Miladi: 1830

Belge özeti: *Rışvan Aşireti'nin Sivas'da değil Konya ve Ankara'da iskan edilmek istediklerine, Cihanbeyli Aşireti reisi Alişan Bey'in tecziyesine dair.*

Kurdî: Serlêdana Mirî êla canbegan Alişan begê di derheqa iskana êla reşîyan ku, ew dixwazin ne li Sêwasê, li Ankara û Qonyayê bên iskan kirinê.

16- Belge tarihi:

H- 25.07.1249, Miladi: 1833

Belge özeti: *Tirkanlı ve Şeyh Bezenli aşiretlerinin arasındaki katl ve yağmadan mütevellid nizain mahallinde halli için yapılan teşebbüsten, Tirkanlı Aşireti'nin Rışvan Aşiretinin korunması ve katilin Gümüştan Maden Emiri Abdurrahman Bey tarafından himaye edilmesinden müsbet bir netice alınmadığına dair.*

Kurdî: Ji bo çareserkirina pirsgirêkên navbera têrikî û şexbezenîyan da encameka baş derneket, ji ber ku têrikî ji hêla êla rêşîyan va hatina pa-

rastinê û mîri Gümüşgan Madenê Abdurrahman begê jî ew kujêr pa-rastinê.

17- Belge tarihi:

H-15.02.1256, Miladi: 1840

Belge özeti: *Konya ve Kirşehir sancaklarında bulunan Cihanbeyli Aşireti beyliği ve tacirbaşılığı için Alişan Bey'e 1241 tarihinde verilen beratın tecdidi.*

Kurdî: Disa dayîna berata di sala 1241 da ji bo serbazirganî û mîrîtiya êlê canbegîyan ya Alişan begê li sancaxên Qonya û Kirşehirê.

18- Belge Tarihi:

H- 24.02.1259, Miladi: 1843

Belge özeti: *Cihanbeyli Aşireti beyi Alişan Bey'e istabl- i Amire (Saray ve Padişaha at yetiştirme kurumu) paye ve nişanı tahsis ve ita buyruldu-ğuna dair tezkere.*

Kurdî: Tezkereya dayîna nişana Istabl- i Amire ya mîrî Canbegan Alişan begê.

19- Belge Tarihi:

H- 29.02.1260, Miladi: 1844

Belge özeti: *Mir Aşireti Müdürü Abdurrahman Bey ve Cihanbeyli Aşireti Müdürü Alişan Bey'in azliyle yerlerine müdür tayini.*

Kurdî: Ji kar dûrxistina mudirî êla mir Abdurrahman begê û mîrî êla canbegan Alişan begê û tayîna mudirekî nû li şûna wana.

20- Belge Tarihi:

H-01.12.1260, Miladi: 1844

Belge özeti: *Cihanbeyli Aşireti'nden Alişan Bey'in aşiret müdürü nasb ve tayini.*

Kurdî: Tayîna Alişan begê ji êla canbegan wek mudire êlê.

(Nota nivîskar: Ew Alişan Beg kurî Xelîl Begê ye, yanê newiyê Alişan Begî mezin e. Malbata Alişanzade *Kökten* ji wi ra dibejin; Kel Alişan)

21- Belge Tarihi:

H- 08.03.1261, Miladi: 1845

Belge özeti: *Cihanbeyli ve tevabii aşairinin iskanlarını havi Alişan Bey'in tahriratının arzı.*

Kurdî: Nivîsa Alişan begê di derheqa iskana êlên canbegan û êlên bi wan va girêdayî ne.

22- Belge Tarihi:

H- 21.01.1262, Miladi: 1846

Belge özeti: *Şeyh bezenli ve Mikaili aşiretlerinin ağnam(koyun) bedeli olarak iddia eyledikleri mebalîğ.*

Kurdî: Bedela baca pêz ya êlên Şêxbezenî û Mikailan ya ku soz dane.

23- Belge Tarihi:

H- 18.03.1263, Miladi: 1847

Belge özeti: *Cihanbeyli Aşireti'nden ahz olunmuş olan neferatdan bazı firar ile Rışvan Aşireti'ne dehalet eden kesianın himayet olunacakları Triğanlı Aşireti Müdürü Dumanoğlu Mustafa Bey tarafından ifade olunduğundan men edilmesi.*

Kurdî: Li gor agahdariyên serokî miduri êla têrika Dumanoglu Mistefa Beg, ew kesên ku ji êla canbegan reviyane, xwe avêtine bexta reşîyan, hewce ye pêşî li wana bê girtin û men kirin.

24- Belge tarihi:

H- 27.08.1263, Miladi: 1847

Belge özeti: *David Savalan'a Cihanbeyli Aşireti tarafından verilecek akçeden dolayı kendilerinin mersuma verecekleri olmadığından hesablarının rüyet- i kati ve geride kalan akçelerinin itasi hususunu Zeyveli, Atmanlı (Etmânî), ve Siğanlı (Şêxiki) ve Hecyanlı (Hêcibî) ve Mikailli ve Şeyhbezenli aşayiri müstedi olduğu.*

Kurdî: Serlêdana êlên zeyveli, etmana, şêxika, hêciba, mikaîla û şêxbezenîyan li ser deynî êla canbegan ya David Savalan de.

Ew hemî êl dibêjin ku tu deyne wan ya David Savalan tunne ye.

25- Belge Tarihi:

H-27.10.1263, Miladi: 1847

Belge özeti: *Cihanbeyli Aşireti'nden Kel Hasan ve kaynu Demir'in Ankara'daki hırsızlık davalarının görülebilmesi için adı geçen hırsızların, Dersaadet'deki aşiret reisi Alişan Bey'in Konya'daki davacı vekillerinin bu tarafa gönderilmesine dair Ankara Valisi Vasfî'nin tahriri.*

Kurdî: Teblixa valiyê Ankarayê: Ji bo ku dawaya herdu dizan; Kel Hasan û jinbirayê wî Demir ji eşîra canbega dizîya ku li Ankareyê kirine were ditîn divê dewavekiliyên dawekarên ji eşîra Alişan Begê ku li Qonyayê ne bişînin hêla me. Alişan Beg li Stenbolê ye.

26- Belge Tarihi:

H-27.11.1263, Miladi: 1847

Belge Özeti: *Harput eyaletine bağlı Çermik, Ergani ve Siverek kazalarının Şeyh Bezenli ve İzoli Aşiretlerinin maktuan Diyarbakırlı Kasım Ağa'ya tahsis kılındığı.*

Kurdî: Ew êlên Şêxbezeni û Izolan ku li bajarên eyaleta Xarputê wek Çermik, Ergani û Siwerekê ne, ji bo Qasim axayî Diyarbekirê hatine tehsis kirin.

27- Belge Tarihi:

H-30.12.1263, Miladi: 1847

Belge özeti: *Cihanbeyli Kürt Aşireti'ne ilhak edilen Geygel Türkmen Aşireti'nin Bilecik Kaymakamlığı'na bağlanıp, aşiret beyinin müdür tayin olunması niyazına dair, zikrolunan aşiret ahalisinin mahzarı.*

Kurdî: Xwesteka xelkê êla Geygel ya Tirkmena; Ew êla ku bi êla Canbegan va hatibû giredan, bi kaymaqamiya Bilecikê va bê girêdan û begî êlê jî wek mudire êlê bê tayin kirin.

28- Belge Tarihi:

H-06.02.1264, Miladi: 1848

Belge özeti: *Ankara'nın Cihanbeyli tevabiinden Hicanli Aşireti Müdürü Hasan ve diğer arkadaşlarının, Rusyalı David Sovalana fazladan ödedikleri paranın tahsil edilmesi hususunda Ankara Şer-i Mahkemesi'nin ilami.*

Kurdî: Îlama Dadgeha Şer-i ya Ankara'yê di derheqa pereyî ku mudurî êla Hêciba Hasan beg ku girêdayî êla Canbegan li Ankarayê ye û ya hevalên wî zêde dane David Savalanî ji Rusyayê, disa ji wî bê hilgirtin.

29- Belge Tarihi:

H-13.01.1265, Miladi: 1849

Belge özeti: *Taraklı Kazasında hazineyi yağmalayan Mikaili Aşiretinden Abdullah Bey'in takımı Haymana'ya gittiğinden tutuklama emrinin Ankara Kaymakamı'na bildirilmesine dair İzmid Muhassılı Şerif Osman'ın yazısı.*

Kurdî: Ji ber ku ji êla mikaila Abdullah begê û hevrêyên wî xezina Tarakliyê (Safranbolu) dervekirine û ji ber bajari Heymanê reviyane, emîrnameya binçavkirina wana ya Muhassili İzmidê Şerif Osman ji bo Kaymakami Ankarayê.

30- Belge Tarihi:

Belge özeti: *Cihanbeyli Aşireti Müdürü Alişan'ın aşiretlerin iskanına memur olan Vecihi Paşa'nın kethüdası Halim Bey'in bazı kişilerden mal ve hediye almasından dolayı kendisinin de haksız yere tedip edildiğinden bahisle Dersaadet'te istihdam edilmesi talebi.*

Kurdî: Serlêdanan mirî/ mudirî canbegan Alişan Begê ji bo Dersaadet'ê, ji ber ku berpirsyarî iskana êlan, Kethuda'ye Vecihi Paşa, Halim Begê bêheq ji hîn kesan xelat û rüşvet vergirtiye, gendelî kiriye û ew (Alişan beg) jî bêheq ji vê tê suçdar kirinê.

31– Belge Tarihi:

H– 29.12.1265, Miladi: 1849

Belge özeti: *Çerkeş kazası civarında-ki yaylaklarda bulunan Cihanbeyli, Mikaili, Hicvanli Aşiretleri'nin kaza ahalisine yaptığı zulüm ve baskınların önlenmesine dair Çerkeş kazası Meclisi'nin mazbatası.*

Kurdî: Mazbataya meclisa bajarani Çerkeşê di derheqa pêşilêgirtina zulm û tedaya êlên canbeg, mikailî û hêciban ku li zozanên Çerkeş û li dorberî wê dimînin da.

32– Belge Tarihi:

H– 14.02.1266, Miladi: 1850

Belge özeti: *Ekecik Aşiretinden Hüseyin ile Ruşen (Reşî) Aşireti'nden İbrahim'in, Cihanbeyli Aşireti'nden Kaideci oğlu Arap Ağa'dan zorla aldıkları hayvan ve paranın geri alınmasına dair Ankara valisine şukka*

Kurdî: Tezkere ji Waliyî Ankarayê ra di derheqa, disa hilgirtina pere û heywanên ji êla Canbegan Kaideci oğlu Arap Axa, ji êla Ekecikê Hüseyin û ji êla Reşîyan İbrahim, ên ku bi dari zorê heywan û pere ji wî hilgirtine.

33– Belge Tarihi:

H– 29.10.1266/M– 1850

Belge özeti: *Paşadağ ve Konya'da bu-*

lunan Reşvan Aşireti'nin iskanıyla uğrasan Halim Bey ve Cihanbeyli Aşiret Müdürü Alişan Bey, garazkarane davranarak aşiret mallarının telefne sebep olduklarından sahip oldukları makam, rütbe ve nişanların geri alınmasına, ayrıca Cihanbeyli Aşireti'ne kaymakam olarak Ali Ağa'nın tayin olunduğuna dair Ankara valisine şukka.

Kurdî: Tezkere ji bo Waliyî Ankarayê, ji ber ku berpirsyare iskana Reşîyan li Paşadax û Qonyê, Halim Beg û Midure êla Canbegan Alişan begê bi qerezan bûne sebep û mal milke êlê telef kirine, maqam, rütbe û nişanên herduyan disa ji wan bê hilgirtin û li şûna wana ji bo êla Canbegan wek kaymakam Ali Axa bê tayinkirinê.

34– Belge Tarihi:

H– 25.11.1266/ M– 1850

Belge Özeti: *Ankara sancağına dahil Cihanbeyli Aşireti'ne Rikab-i Hümayun (Padişahın Korumalarından) kapıcıbaşlarından Ali Ağa'nın kaymakam olarak tayin edildiği.*

Kurdî: Di derheqa tayina Qaymaqamtiya Kapıcıbaşiye Rikap-i Hümayunê Ali Axa ji bo êla Canbegan li Ankarayê

35- Belge Tarihi:

H-12.10.1267 / M- 1851

Belge Özeti: *Cihanbeyli, Atmanlı, Şeyhbezenli, Mikaili, Emirler(Şexika), Keykil, Ziveli ile Tabanlı (BALA) kazasının adet-i ağnam rüsumunun, adı geçen aşiretlerin kaymakamı Rıza Bey'e ihalesi.*

Kurdî: Dayîna ihaleya baca kerî û pezî êlên li Ankarayê canbeg, etman, şêxbezenî, mikaila, emirler (şêxika), keykil(geygel-türkmen) ziveli û bajarokê Tabanlı (Bala) yê ji bo kaymakami ew êlana Rıza begê.

WERGERA ÇEND

BELGENAMEYÊN JI OSMANÎ BO TIRKÎYA NÛ

Belgenameya herî kevn di derheqa sirgun û iskana Kurdan ji bo Anatolya navîn û derdorên din.

Hicri: 1108, Miladi 1692

Belge Özeti:

Türkmen ve Ekrad kabile ve aşiretlerinden herbirlerinin nehir sahiline iskanla tekalif- i miriden muafiyeti hakkında Rakka vali ve kadısına emirname.

Kurdî;

Emirname Ji bo vali û qadiyên bajarî Raqqayê; Êlên tirkmen û kurdan li dorberî çemî Firatê bên bi cîhkirin û ji wan bac neyê hilgirtin.

Bi zimanî Osmanî, tîpên latînî;

Rakka Beylerbeyine ve makamlarına hüküm ki;

Aşair ve kabailin Türkmen ve Ekradın emir vermesini muafiyet şartıyla birer mahalleye iskana ferman olunmasını rahili aşairi Türkmeni ikamet için..... ubur eyledikleri mahalleri iskan mahalline salim veüzere oldukları i'lam olunup mezkur aşair dahi Rakka havalisine nehir yoluyla konarlarsa ve Rakka havalisine avdetleri dahisair Ekradlar ve Türkmen aşairi sakin oldukları vecih üzerine ol havalilerin kati -u tarik (Yolkesen) ve eşkiya taaruzlarından emin idup.....ubur edenleri aman(emin) ve mutmain edilmek üzere getirdikleri eşya ihtiyaçlarının Kethuda intisab edip içlerinde eşkiya hududlarından musavi zemin(kefil) olurlar ise kendileri iktida edip taayüt ve hakem teslih eylemek üzere mukabele istese resum...u raiyet davalar dahi terki salahiyet virene muavin ve musellem olub ancak ziraat ve haraset (Çiftçilik) eyledikleri arazide hasil-i irade dahi alamadıkları mahsulleri ve sair bağ ve bahçe ve bostan eyleyib teriyyesine tahammülüne köy tahakkukları istihkak üzere serd ve mezkure ikamet olsa. İttirilmeli deyu emr-i şerif yazılmak ilave tezkeredir.

2B Safer 11. B(1692)

Di nav ew nivîsanada ji tê derdikeve ku, pirranîya va êl û eşîrana ji sirgunê reviyana û dîsa vegeŕiyane cî warên xwe yên berê.

Le mîr û begên ew derana ew tişt dîsa ji Stenbolê ra xeber dane û li ser vê ew emirnameyên li jêr dîsa derketine ku, ew êl û kesên ji Raqqayê reviyane, li derberên din û bi pirranî jî li Anatolya Navîn û Rojavayê Anatolya bèn bi cîwarkirin.

Hicri: 29.03.1157, Miladi: 1744

Belge Özeti:

Malatya'nın Şutili kazasındaki Cihanbeyli aşiretinin Rakkaya iskanlarına ve Malatya'nın eşkiyadan temizlenmesine dair Diyarbekir Valisi Ali Paşa ve Malatya Mutassarıfı Rışvanzade Mehmet Paşalara hüküm.

Kurdî:

Ji bo Valîyî Diyarbekirê Ali Paşa û Mutassarıfî (Mîre Sancaxê) Meletiyê Rışvanzade Mehmet Paşa ra hüküm;

Êlê Canbegîyan ku li Şutilî ya Meletiyê ne, ji wir bèn surgunkirin û li Raqqa yê bèn iskan kirin, Meletye ji eşkiya bê paqij kirinê.

(Têbîniya Nivîskar: Şutilî îro nave kuderê ye, em baş nizanin. Lê li bajarokê Pötürgê çemê Şiro heye û li vir Canbegî dijîn.)

Rupel 1, bi herfen Latînî:

Katî olanlarına vakıa teslim olanları mudafî olabilecekler hakolunmak carb-i

sadır olunarak ol maraştan birerlu icabeleri mümkün olmadığına dair ayrılan aşiret-i mezkurdan Mehmet oğlu Hallo olub dahi Ibrahim ve Musa bey oğlu Osman ve kardeşleri....Karabey oğulları Rızo ve kardeşleri ayrilub Osman veledi Abbas icabet ve Sarı Mehmet oğlu Alo Ramo bir diğeri olub karar-i icabe.....oğlu Hacı olub, kulları...Teyi oğlu Hamo kardeşleri olub kullar ve Ferman oğulları Hallo olub kullar.

Said oğlu Mehmet olub dahi Cevher oğlu Çaksuvar olub dahi Kürd Hüseyin ve kardeşleri Afra ve Hüseyin ve Karabey oğulları olub dahi Haso oğlu Ibrahim ve Ömer oğlu Ibrahim ve Nebioğlu Hacı Mustafa olub kullar.

Ve Sarı oğlu Mehmed ve kardeşi oğlu Kör Hüseyin eşkiyasından....binaenaleyh....kazalarına atasınız. Nefer olmalarıyla bi gayri katlolmalarıyla teferruatlarına maarruz ve katletse mazur olanlar bi karar kalib dahi babaları ve babalarına cebren ve kahr ile götürdüklere gayri azınlıklar emellerine muaffakata(şan) olunan....kötektir.

Rışvan vehalleri nihayeti almadiğınıza zalimlerine icabet etdikte muavenet etmeyib.....ve perişan oldukca iyalleri ve bilahare asayış ve sukut ola ve zinhar mağdur olmalarına müsaade edilmeyip hallerine merhamet ederek şuru etmek. Ve eğer hak aramış muazib edildikleri umulan danışib dahilleri görülünce yine arzuldıklarına.....kendileri.....olmak miyaş muaffakati ve Diyarbekir dolayları.....

mahur seraskeri ve Tiranşar(Piranşar?) a-layi mukızınca Rakka,ya iskan ve götürüb Rakka mutalimi mucibince teslim olduğu musarun devle(ileyh) daisine olunub şuru fırır olunmalarına müdafı olunmak.

Paşa hükmü caiziyeti istirham eylemelerine vechi müşharun ileyh emel olunmak Paşaya ferman arz olunmuştur.

Rupel 2, kopya orijinal a osmanî

Rupel 3, bi osmanî

Rupel 4, bi osmanî

Bi herfen latîni:

Merbuteyi mutasarrıfı Rişvan Al-i Mehmet Paşaya hüküm ki ;

Rakka Ahalinize, mahalli askerlerinize huruca ve merbut-i sancağınıza vaki şunları kazanıza tavattur ide Cihanbeylu aşiretinize Ömeranlı cemaati eşkiyası cihetlerine mermuz olarak karar-i şekavetlerine icabe-i iptila ve kulları riayete isaliniz ve mazarratlarına zinhar ilam ve ihbar olundukları şahı Mir Miran mumaileyh sen eşkiyayı merkumeleri ve Kürd Havza Hükümetine sair zahirlerin bilmezlerin fakr ul üzerlerinize defa ve refa şer ve mazarratlarına ewlad u iyalleri tayin ve tatmin imha için bilrefan ol emr aliyenle sana tembih ve teksir olunmağa.

Havza hükümetini ol makbul ol sehvadan Paşadan.... tathir lüzumu halleriyle şer kusur bulduk.

Ol emr-i aliyeme mugayir ve rizayı halveti huzuraneme muhalif.... yaramazlara şer ve şekavetlerinize ağmaz (Göz

yummak) ve tevehbi eyledüklerinden..... eşkiyayı merhume ferce bulub an hüsnümüze.... kolay riayet olunarak zipal isaliniz ve hasarın altın ve diyete çevrildikde gittikçe terki olmak hasebiyle ekseri Türk olanları mahalli olanları mahalli ahire perişan ve ilhate hazihi eşkiyayı salif elbisenize müsreib (Muhtac) olarak otuz kırk neferi kimseler iyal ve evlamlarıyla hal aliyeme gelib nizam-i hal etmeleri bu makul emr ma'mur ve bahane izhar eden kes ve rehavete cesareti-i heyecan arz hayurlularına bağış vebali olub müstehak azb ve itab olunmağa....

Kaza-i hafete mübaşireten eşkiyayı merkumeyi ola istihal-i kaza hah nahah kaldırıp mahalli iskanları üzere Rakkaya nakl ve tavattun ittirmek şartıyla bu defa oluncak ...tahrir ile berfa ve harkah malum Kapıcıbaşlarınızdan,Diyaarbekir ahalisinden olub bu hususa mübaşir tayin olunun Molla Ali Dallam Mehire ile muatiyeten fikrinden şekavet pişeleri sayı ve cihetin kah mahal erkanlarını sevk ve tesyir(gönderme) ile şer ve mazarratlarından kaza, mezbur ahaliyi önderlerine defan ve refan me'mur ve tayin eylemeyi hususen hatacını mezbur seralay vezirim Ali Paşa olamasın.

Ahaliyeye başka emri şerifi usulleri ile irsal olunmuştur.

İmdi şeyhi Mirmiran mumaileyhin ber vechi muharrer saikai merkume-i fi mahalli erkanlarına tagayyur ve tavattun eylemek hususunda serasker ile tarafınıza iskana... tavsiye ve tembih olunurlar.

Teveffuk emr -i şeriflerine amel ve harekete kıyam ve mübaşir mumaileyhin marifeti ol şekavetin pişeleri ola irhalden oldukları mahallere acemistanın mecmuu ve bilcema... mal şeyleri ile kaldurub mahalli iskanlarına nakl ve tesyir ve Rakkaerkan ve takrir ile keyd ve mazaratlarını evlad u iyal üzerlerine defa ve refa sarf mahsusen vesa olmayıb...sahavet ve Terkan izharınıza ziyade hüner ve mecanin eylesin.

Eşkiyayı merkumenin her ne tarik olur ise olan makari iskanlarına nakl ve takrirleriyle sakin ve yerlu ve Türk ahallilerin iyal iktizayi meram hayr-i il cam-i mulukaneme eylesin bundan sonra dahi hususi merkume tevan mehazi ve terahiye cevaz-i hassa misullu bir hareketin sudur eylemeli.

Semi-i Hümayuna ilka olunur.

Fermanima gelubler, buraya özr ve itab-i kati... olunub mazhari ikab ise öyle cemiyet muakrer ve muhakkak olmak ikannin incam kari muhaza ve sana sordum,

Kala....emr-i şerif-i tenfiz ve icabeye ihtimam Rakka tahsis-i riza-i humayun -----buyurur.

Rupel 5, bi herfen Latini:

Şah (Padişah) tarafından görüldü.

Diyarbakir vilayeti...mezbur Seraske-ri vezir Ali Paşaya mutasarrıf Rişvanli Mehmet Paşa, ya ve dergah merfu Kapıcı-baslarımızdan olub halen Diyarbakir..... hassaten mübaşir tayin olunarak Molla

Ali mecrayı hüküm Rakka erkanınızdan ikenukde-i mahallerinizden huruc ve firar ve haddi merbutesini iderek..... Cihanbeylioğlu aşiretinizin Ömeranlı ce- maati eşkiyayı kendi hallerinde olmayıb Humayunca Rakka, ya Rakka eşkiyayı mezbure kaldırılsın. Mahalli iskanları olarak mahalli nakil ve tavattunları şer ve mazaratlarının fukara, zuefa tayin olunmakla adalet için terk.

Vezir masur ve mirmiran mumailey- hine hassaten mefhar ve meşru ol emr-i şerife sadir olmagla eşkiyayı sabık aynıyla sadir olarak emr-i şerifi alileri vechine had oldukları yerlerden kaldırılarak mahalli iskanlarına sevk olunmalarına temin. Yerlu Zeriki kalıb iyale azik ve canlar u cebr....ve kati olan nüfusun muadasını....mir miran mumaileyhin Kürd eşkiyayı mezkurenin Kürd havza hükümetine zuhur eden şekavete pişeleri dahi.....alınmayacak.

Eşkiyayı merkume havza hükümetinden zuhur eden şekavete pişmanları Rakka Kebir ve kızanlarına eklenecek. Bilrefan ol emr-i şerif....şikayetine tekid ve eşkiyayı merkume havza hükümetine....olmak takriri tenfizi ve icray-i emri Alişana meşairden ziyade takyir- ve almağa imkan olsa fukaraların ademi takyid ve askerinin....mazmun emri şerif tenfiz....gayri bazi hususların Kaza-i mezbur fıkrasını ekber.....şekavete pişmanların fakir ve zaiifanlarınız ağmaz ve tevbih edildikten sonra eşkiyayı merkume ferah bulub fakirleri raiyet olunduktan

Handwritten title in Ottoman Turkish script, likely 'Emirname'.

Main body of handwritten text in Ottoman Turkish script, detailing the appointment of Cihanbeylis to Rakka.

Large block of handwritten text in Ottoman Turkish script, continuing the official decree.

DEVELİ ASHİLERİ GENEL MÜDÜRLÜĞÜ
CUMHURİYET ARŞİVİ

Belge 71- Malatya Sutulu ilçesinden Rakka'ya iskan edilen Cihanbeylilerin iskanı
Rişvanzade Mehmet bey ve Diyarbekir valisi Ali'ye emir-1157

ziyade isal kendu hasarin sarf eyesin.

Denir ki Mirmiran ve Kapucubaşı mumaileyhine siz muşarun ileyh tarafından size ne guna tavsiye ve tenbih olunursa edulen emri derk üzere azm u harekete ve halife merkumeyi had olundukları mahberin mecmuaları ve bilcümle olarak şeylerin kaldurub mahalli iskanlarına nakl idileler ve muttali muma ileyhe ve tekrar ile seyr u seferinize evlad ve iyalleri tahliyenize ve kararın sırf mahsur mekena olmayib.

....

Ew belgenameyên ku li jor bi tirkî û kurdi ji we ra pêşkeş bune, birreke ji tarixa sirgun û iskana kurdên Anatolya Navîn in.

Ew paşayên osmaniyan ku ew iskan kirine, mîrên kurdan ku bi wan re karkirine û piştî îskanê li Ankara, Qonya, Kirşehir û dorberên din li Anatolya Navin wek berpirsyare Êlan hatine tayin kirinê ew in:
Padişah: Sultan Mahmud II, Sultan Abdulmecid

Memur û paşayên dewletê;

- Waliyê Diyarbekirê Ali Paşa
- Vehbi Paşa
- Kethudaye wi Halim Paşa
- Kaymakam Abdurrahman beg
- Kaymakam Riza beg
- Ali Axa, Kapucubaşı

Mîr û begê Kurdan:

- Mehmet Paşa, Mirê reşîya li Sancaxa Meleytê.
- Alişan begî I, Mirê Canbegan
- Alişan bege II, kure Xelil Begî Alişan Begê
- Mustafa begî Alişanzade
- Xelil begî Alişanzade
- Omer begî Alişanzade
- Îshak Lütü Efendi Midure êlê şêxbezenîya.
- Ali Riza Efendi Midure Nahîya Şêxbezenli(Sindiran, Gökgez) H.1320, M: 1904
- Dumanoglu Mustafa Beg, Midure êla Têrikan
- Mustafa beg, Midure êlê Reşîyan.
- Hasan Beg, Midure êla Hêciban.
- Alişir Beg, reise êla Mikailan



Belge 72- Cihanbeyli iskanı S.2 1157

Handwritten signature or title at the top right of the page.

Main body of handwritten text in Ottoman Turkish script, written in a dense, cursive style.

Handwritten word or phrase, possibly a name or title, located in the middle of the page.

Small handwritten note or signature at the bottom center of the page.

Handwritten phrase or title at the bottom of the page.

Large block of handwritten text in Ottoman Turkish script, continuing the main body of the document.

Handwritten Ottoman Turkish text, likely a legal document or a record. The text is written in a cursive script and is arranged in several columns. There are some red ink markings and a large, stylized signature or stamp at the top right. The text appears to be a formal record or a legal document, possibly related to land ownership or a court case, as suggested by the caption.

Belge 75 - Cihanbeyli iskanı S.5- 1157

Handwritten Ottoman Turkish text, similar to the one above. It is written in a cursive script and is arranged in several columns. There are some red ink markings and a large, stylized signature or stamp at the top right. The text appears to be a formal record or a legal document, possibly related to land ownership or a court case, as suggested by the caption.

Belge 74- Cihanbeyli iskanı S.4-1157

Hevpeyvînek bi Alî Duran Topuz re: Kîtêbeka welatê xeribîyê: Rû û Kûr

Adem Özgür

Wexta ku min kitêba Alî Duran Topuz a bi navê “Rû û Kûr” dixwend, gotineka Mehmed Uzun dihate bîra min. Uzun, di kîtêbekê de qala “Welatê Xeribîyê” dikir.

Welatê xeribîyê, ev sed sal zêdetir bûye qedere me kurdan. Rojnameger û parêzer Alî Duran Topuz jî li welatekî xeribîyê dijî û di berhema xwe ya nû de qala jîyan, êş, kul, hezkirin, bawerî û xeribîyê dike.

Kitêba wî ji çîrokên mînimîl pêk tê. Di berhema xwe de devoka Qoçgiriye ya bêtir bi devkiya xwe bi stran û kilaman ve zindî hiştiye emilandiye.

Topuz, li ser kitêba xwe ya nû bersivên Bîrnebûnê da û got: *“Zimanê ku nayê dengkirin zimanek mirî ye. Zimanê ku tê dengkirin her tim, li her derê vediguhere, gêş dibe, li her dere, tê de cudahî derdikeve, varyantên nû çê dibin. Qanûna zimên ev e.”*

Ez ne şaş im, heta niha tu kitêbên bi devoka Qoçgîrî hatine nivîsîn, nîn in. Te çima biryarek veng da ku, bi devoka herêmi nivîsî?

– Erê, min bi devoka Qoçgîrî nivîsand. Lê ev kiteba min a yekem e, an nîne ez jî nizanim. Min bihîst ku, birêz Dursun Evren, bi devoka Qoçgîrî romanek nivîsiye. Ez pir lê geriyam, lê min heta niha nikarî wê romanê bibînim. Herhal rind belav nebûye. Xeynî ji wê pirtukê,

pirtûkek ku bi devoka Qoçgîrî hatiye nivîsandin, min ne dît ne jî bihîst.

Min ji ber sê sedeman ev biryara da: Ya ewil ev e ku, ez derd û ramanên xwe bi devoka xwe hê hêsantir dihênim zimên. Va sebeba şexsî ye û hebikî psîkolojîk e an jî gîredayiyê rabirdûya min a şexsî ye.

Sebeba duwem, sebebek ramanî an jî fikrî ye. Standardîzasyona zimanan karek sazmandiyê ye. Helbet, divê mirov ji bo standardîze

kirina zimanê xwe bixebite, lê mirovek tenê nikare təkiliya devoka xwe ya bi zimanê standart ve bigire ber çavê xwe û zûbizû derbasî zimanê standard bibe. Heta ku perwerdebûna fermî û merkezî were saz kirin, kî/kê çawa dinivîse bila binivîse, nivîsên wî/wê ji alîkî ve devokî (hebikî jî bi devkî) dimîne. Ji van her du sedeman jî sedema min a seyemîn derket holê: Ên ku bo standardazisasyonê dişuxilin û difikirin, wan re qeyd û qayde û mînakên devokan jî pir lazim in.

Di kitêbê de jîyana kurmancên Qoçgîrî, rewşa elewîyan û zilma li ser wan; nifir, hezkirin û koçberî heye. Tu dikarî ji me re qala çîroka vê kitêbê jî bikî?

– Çîroka kitêbê, him çîroka malbata min e û him jî çîroka min e. Ez 45 sal in, li Stenbolê me û di van 45 salan de perwerdebûna min, şixulên min, karên min ên rojkî hemû bi tirkî ne. Wek tê zanîn, qezenca xwe jî bi tirkî dikim. Ez roj-namevan im û parêzer im. Stenbol, ne tenê bajarek herî mezinê dinyayê, bajarek herî mezinê kurda ne jî. Belkî sê, belkî çar milyon kurd tê de dijîn. Lê ne tabelayek, ne anonsek, ne afîşek bir kurdî heye... Di vî bajarî de min her tim qîret kir ku

zimanê dê û dapîra xwe ji bîr nekim.

Erê, em kurd dibêjin “zimanê kal û bavan”, lê bo min kurdî zimanê diya min û dapîra min e. Ew herduyan ku nebûna min zimanê xwe zûde ji bîr kiribû.

Îro bin tava megapolê de gulên zimanê Qoçgîrî diçilmisî diçe. Her tim min dixwest ku hêkat û meselên Qoçgîrî, qezî û gotinên Qoçgîrî, dengên Qoçgîrî winda nebin. Ew deynê stûyê min bû. Ji alîkî ve jî ez ditirsiyam ku zimanê min têra xwastina min nayê. Lê wê gavê jî mamoste Selîm Temo derket hemberî min. Rojekî ew bûbû mîvanê min. Min daxwaza dilê xwe ji wî re got. Mamoste Selim him cesaret da min û him jî destê xwe ji pêşîra min nekişand. Bi alîkariya mamoste Selîm ez ji tirsaxwe xelas bûm. Alîkariyek mezin jî min ji Mazlûm Doxan dît. Wî, kiteba min wek kiteba xwe girt. Ji bo weşandinê jî ez çûm ber deriyê Avestayê. Kek Abdullah Keskîn, deriyê weşanxanê bi dostaniyê vekir û bi bêhnfirehiyek mezin kitêb amade kir.

Derbarê kitêba te de heta niha bertek û rexneyên çing hatin?

– Pir reaksiyonên xweş hatin. Ji kesên nivîsên min ên bi tirkî

xwendin û di televîzyonan de ez guhdardikirim re hebikî surprîz bû. Kitêb hînê belav nebûbû kek Evdila û ez, em bi hev re çûnê fu-ara pirtûkan a Amedê, li wê derê pir eleqayek xweş hebû. Wek Qoçgîriyan dibêjin, *ez bûm çiya!*

Ji aliyê Şêxo Fîlîk rexneyek tûj jî hat. Wî, jî çar alî ve rexne da pirtûkê. Ji bo min digot, “nivîskarekî tirk”. Va neheqîyek giran bû û vê gotinê hebikî dilê min êşand. Ew tiştên ku paşîya kitêbê de hatiye nivîsandinê rexne fikir ku, min jî heq da wî. Fîlîk, eleqa ya siyasetmedaran re jî hêrs bûbû, lê ez jî dikarim tev Fîlîk bibêjim ku siyasetmedarên me divê bi hemû kitêb an jî kovarên kurdî re eleqedar bin. Wekî din jî, li gor wî, hema hema hemû çîrokên ku di kitêbê de hene, an jî klamek, çîrokek gelerî hatine berhevkin, lê ji xwe re gotiye nivîskar an jî çîroknûs. Ez jî ji vê rexneya paşê re nexwazim bibêjim neheq e. Ji ber ku berhevkin çî ye, nivîsandin çî ye, kevneşopî çî ye, modern çî ye divê em wekî herkes li ser bisekinin, bifikirin û nav hev de mînaqêşeyan bikin. Jixwe, ev nîqaşek herî kevn e! Ev rexneya Şêxo Fîlîk bû, Înan Erdogan bersîvek nivîsand, lê va mînaqêşa dirêj nebû. Belkî qele-

ma Şexo Fîlîk weqes tûj û bi hêrs nebûya gotûbejek baş derdiket.

Wekî din, Hamîd Omerî bi kurdî, Muslum Yucel bi tirkî tiştên xweş nivîsandin. Birêz Zinarê Xamo berî hemuyan li ser pirtûkê nivîsandibû, lê nivîsên wî ne rexne bûn. Mamoste Zinarê Xamo şahîya dilê xwe anîbû zimên kû bi devoka Qoçgîrî kitabek hatiye nivîsandin.

Te li jor qala devokê kir. Li her dewerê, zîmanekî dewkî tê deng kirin. Ez dixwazim disa bipirsim; tu ji bo girîngîya zîmanê devkî çî difikirî?

– Zîmanê ku nayê dengkirin zîmanek mirî ye. Zîmanê ku tê dengkirin her tim, li her derê vediguhêre, gêş dibe, li her derê tê de cudahî derdikeve, varyantên nû çê dibin. Qanûna zimên ev e. Va qanûna jî ji me re dibêje ku, devok çiqas dewlemend in zîman jî ewqas dewlemend e, zîmanê nivîskî çiqas dewlemend be bila bibe, can û rihê zimên di zîmanê devkî de ye.

Latînî pir zîmanek dewlemend e, bi sed hezaran, belkî bi mîlyonan pirtûk û tomar bi latînî hene lê ew mirî ye. Heta demên nêzik fikra standardîze kirina kurdî li holê tune bû, tiştên ku hatibûn nivîsandin kêr bûn, lê kurdî bi devokan heta

îro hat. Me bala xwe neda ser devkan, bala xwe neda ser zimanê devkî, em nikarin standardizasyonê li gorî qeyde û qanûnan çê bikin.

Li gundên kurdên Sêwasê rewşa zimên çî ye? Keç, xort û kurik bi zimanê xwe deng dikine, li zimanê dayikê xwedê derdikevine?

– Min pir dixwast ku ez bibêjim rewş pir baş e, lê wer nîne. 45 salan berê, gava ku hînê ez li gund bûm, sê caran tev ceman bûbûm. Cem, hûn dizanin, ayîna qizilbaşayê olî ye. Seyîd hat, civat girêda û em jî ketine cemê. Di wan ceman de min tenê belkî du belkî sê hevokên bi tirkî bihîst û Seyîd du an jî sê deyiş bi tirkî got. Ez par li Stenbolê jî tev cemekî bûm. Min tenê du hevokên kurmançî bihîst. Zakîran bi kurmançî tenê du beyîtxwandin.

Wekî tê zanîn, kurdên elewi yên Sêwasê zû de koça metropolan kirin. Ev koç di 1950an de dest pê kir. Niha ji sedî zêdetir gund vala ne, yên di jî nêzikê vallahiye ne. Keç û xortên ku îro li Stenbolê ne û ji bîst salan piçuktir in, neslên seyemîn an jî çaremîn in. Çaxa dê û bavên wan, çaxa kal û pîrên wan fikra xwedî derketina kurdî tune bû, erê wan ji zimanê xwe pir hez dikirin, lê nedizaniyan çî bikin an

jî çawa bikin ku zav zêçên xwe re hîn bikin. Axirî, koça Qoçgîrî ya dawî koçek gir û ber bi têkçûnê ve bû. Domana pênçe salan de ziman heliya çû. Îro jî domana hilweşînê berdewam e.

Ezê pirsek cûda jî bipirsim. Tu wekî rojnameger û nivîskarek rewşa rojnamegerê, weşangerî û edebiyata kurdî ya li bakûr çing dibînî?

– Rewşa rojnamegeriyê ne baş e, zordestiyek herî mezin li ser saziyan û rojnamegeran heye. Dîsa jî keç û xortên pir serfiraz û serbilind hene, karên pir pir xweş dikin, bo wê rewşê bêhêvî nîne. Weşangerî ez dikarim bibêjm roj bi roj pêşve diçe, lê du meseleyên girîng hene. Yek meseleya belavkirinê ye, yek meseleya nasandinê ye. Divê weşanxaneyên ku hene werin cem hev, fuaran çê bikin, kitêbxaneyan vekin. Rewşa edebiyata kurdî jî ji her alî ve her roj pêşve diçe. Kitêbên di mehekê de çap dibin, berê di deh salan de nedihatîn çapkirin. Him ji aliyê qalîteyê yanê hêjmaran ve, him jî ji aliyê qalîteyê yanê wesfê an jî çawaniyê ve rewşa edebiyata kurdî dilê min şa dike, ez hevîdar im her roj ji ya berê çêtir be.

Tu xebatên te yên nû hene?

– Ez niha li ser ferhenga devoka
Qoçgîrî dixebitim.

*Pirsa dawî, tu kovara Bîrnebûnê
dişopîni?*

– Erê, ez dişopînim û jê pir hez
dikim. Hûn her hebin. Bi navê
Kurdên Anatoliya Navîn.





Foto: Mirad Bayram

Çîrokek ji kitêba *Rû û Kûr*

Genim û biratî

Du bira li ser xonçê seba parîkî
goşt bi hev ketin. Dapîr gêşt van
ew lihew hanîn. Paşê ji futeya
xwe kîsikik derxist. Ji kîsik jî he-
bik genim vavêrt û girt kefa destê
xwe, nîşanî zaran da û got: “Ka
win rind sêrê kin, li ser vî hebî
mora Xadê heye. Xadê gotiye her
nîvîk ya xeng-birayikî ye.



PORTREYA ALÎ DURAN TOPUZ:

Di sala 1967an de li Sêwas/
Zarayê hatiye dinyayê. Mal-
bata wî di 1976an de koçî
Stenbolê dike. Du salan dibis-
tana destpêkê dixwîne. Hinî
tirkî dibe û mektebe ji derve
xilas dike. Fakûlteya hiqûqê a
Unîversîteya Stenbolê diqedîne,
çend salan parêzerê dike, tevî
ku hê jî endamê baro ye lê ji
1994an ve rojnamevanî dike.
17 sal in li rojnameya Radikal
kar kir, bernameyên TV û rad-
yo amade û pêşkêş kir. Ji salên
90î ve şî'r, çîrok û rexneyên wî
di kovarên edebî de çap bûn.
Li ser mijarên polîtîk ên rojane
gelek gotar nivîsandin. Êdîtor
û avakarê Gazete Duvar e ku ji
2016an ve weşanê dike.

Bêhna bêrikirinê*

Arvîn Berchemî

Dîwar bilind û dirêj bûn. Berf û baranê bi sermayaya dijwar re bi demdirêjî li wan kiribû. Roja sotîner a Anatoliyaya Navîn kêlî bi kêlî ew dîwar şewitandibûn. Di nav salan de riziya bûn. Cih bi cih ji hev de diketin, sewaxên wan diweşiyên, êdî hildiweşiyên. Toz û xubara xwe bi bayê dicemidîne re berdidan nav porên reş û spîbûyî. Lê di nav porê zîvîn de qet xuya nedibûn.

Du hevrê di nav wan dîwaran de, li ber dîwarekî dimeşiyên. Di hewşa teng de bi bêhnfirehî diçûn ber dîwarê li hember û bi hestfirehî dihatin ber deriyê menzelê. Dîwarê ku ji xwe re kiribûn talde û li ber dimeşiyên wekî cinawirekî sekinîbû; bi toz û xubarê zextên girtîbûn û dîlbûnê li wan dikirin. Ezmanê bêserûbin dûr dixist û bi sê dîwarên din ên hemsal û hevrêyên xwe re ezman çargoşe û teng dikir. Rengê ax û daran qedexê dikir, dengê betonê li ber çavan datanî.

Di hewşa weke bîrekê de hevok di dilan de dihatin sazîkirin, bi kêfxweşî û hêviyê ji lêvan diherikîn.

Wan hevokan rengê dîwaran diguhart, dengê axê dianî. Di wan kêliyan de rizîkirina dîwaran bêbandor dibû, ji holê radibû. Bêhn û tehma azadiyê difûrand û ew cihê teng bêserûbin dikir. Li vir li ser betona hişk û kafir çokên ku her tim diêşiyên bi pêgermokê germ dibûn, bi raman û hêviya rizgariyê sivik dibûn. Her du hevrê bi kêf û henek diçûn û dihatin. Bi bîraninên qerfî dilên hev xweş dikirin, bi nîqaşên hêvîdar serên hev zelal dikirin. Di bin bayê esirê de bi zindîkirina jiyana xwe ya deh sal berê û zanebûna xwe ya îro tê digihîştin wateya azadiyê. Dîwarên zindanê roj bi roj hildiweşandin; cih bêwate, dem têrwate dibû.

Hest, raman, dil û hêviya dê jiyana azad û azadî çawa bibe germ bûbû ku ji zeraqeya teng û biçûk dengê hat. Ji her du hevrêyan ê dirêj û xurt beriya yê din berê xwe da dêrî. Gardiyanê pozxwar û serût bi kîn û kerxekê zeraqê vekir û berda. Dema berda bi hişkî li dêrî ket û dengê ku guh diteqand menzela

biçûk dagirt. Gardiyan bêyî daxûl bibe û li hundir binêre bi dengekî dijminane got:

“Mistefa” Hîna hevrêyê dirêj negihîştibû dêrî gardiyan bi qehr got:

“Bila Mistefa were.”

Mistefa bi bejn û bala xwe ya xurt bi du gavan hat li ber zeraqeyê sekinî. Gardiyan bi çavên bijiqî bi awayê bê hest û bê wate li Mistefa nêrî. Pirsî ku ew Mistefa ye yan na. Bi bersiva erênî re tûrê di destê xwe de vekir, çend perçe kinc di zeraqeyê re da Mistefa. Tûrê valabûyî di destekî xwe de qermiçand û mîna gilokekê kir. Mistefa bi awirên ku dipirsin ka tûr jî nade lê nêrî û paşê bi tirkiya xwe ya şikestî ku paşê hîn bûye pirsî:

“Kê ev kinc şandîne? Ji ku hatine?” Gardiyan bi xeyidîn bersivand:

“Ez nizanîm. Ma tu yê hîn bibî wê çi bibe.” Hîna Mistefa tiştek negotibû, mîna derîçeya zeraqeyê li rûyê wî xe girt û bi guvaştina tûrê di destê xwe de çû.

Mistefa tu tiştek fêm nekiribû. Carekê li dêrî, carekê li kincên di hembêza xwe de, carekê jî li hevrêyê xwe yê li paş xwe sekinî nihêrt. Hevrêyê wî li kincan nihêrt

û şroveyek kir. Lê pir neket serê wî û çû kinc avêt ser ranzayê. Yek bi yek ew saxtî dikir ku di etîketa kincekî de nivîsa erebî bala wî kişand. Wî ew xwend û yê din jî xwendin. Li Sûriyê hatibûn çêkirin. Lê tê negihîşt encamekê.

Dema dixwend, bêhneke ku ji bîra wî çûbû xwe da hîsandin. Ji hev dernexistibû ev bêhna çibû û ev kinc ji ku hatibûn. Ji nû ve û bi baldarî bêhn kir. Vê carê bi bêhnê re zarokatî û gundê wî hat bîrê. Panzdeh sal bûbûn ku ji gund û gundiyan xwe û ji malbat û nasên xwe dûr bû. Her ku bêhn dikir ew nas û gund li ber çavên wî zindî dibûn. Herî dawî diya wî hat ber çavan. Ji xwe pirsî: “Ma diya min ev şandîne?” Dûre bi xwe bersivand: “Ma diya min a reben ji ku dizane ez li vir im û ew ê çawa bişîne?”

Ew çend perçe kinc li ser ranzaya teng belawela bûbûn. Hestên Mistefa jî belawela bûbûn. Hestê bêrîkirinê hejiyabû û şiyar bûbû. Bi vê re tiştên ji bîr kiribûn hatin bîra wî. Tehm, reng û dengê ku gav bi gav ji bîr dikir, ji nû ve geş dibûn; gerîna pêxas a li nav axê, şivantiya pêz, şikandina tîbûna xwe bi ava çem, têrkirina zikê xwe

bi xwarinên diya xwe, dizîna titûna bavê xwe... Gelek tişt hatibûn bîra wî û ketibûn xewna wî. Çend perçe kinc bûn, nizanibû ji ku hatibûn. Lê bêhna wan dizanibû, bêhna bêrîkirinê bû.

Sal bihurîbûn. Bi salê re gelek tişt bihurîbûn. Porê reş zîvîn bûbû. Rû qermiçîbû. Çav ji hal ketibûn, êdî baş nedidîtîn. Êş diket serê ku bi ramanekê mijûl dibû. Bêhn diçikiya. Qirik diêşiya. Lê hêvî xurt û mezin bûbû. Bi berxwedanê rîya rizgariyê hatibû kutan û çend tiştên biçûk bin jî hatibûn bidest-xistin. Girtiyên derfeta telefonê bi dest xistibû. Girtiyên azadiyê di serî de dîwar ji holê rakiribûn. Paşê xwe gihandibûn gelek cihan. Niha jî dikaribûn dengê xwe bigihînin malbat û dostan; a girîng jî dengên ku ji bîr kiribûn dikaribûn dîsa bibihîzin.

Mistefa dê cara pêşîn telefon bikira. Bi peroş li pey hev pêlî çardeh numreyan kir. Bi her jimareyê re dilê wî zêdetir lê dida. Piştî keliyekê ji hember dengê hat. Lê Mistefa xwediyê wî dengî nas nekir. Navê diya xwe got û pirsî ku ew li malê ye yan na. Di demeke kin de dengê

di telefonê de guherî. Dengêkî pîr û westiyayî got:

“Elo, tu kî yî?” Qirika Mistefa xitimîbû. Bi dengêkî nizm qirika xwe paqij kir û bi kelegirî got:

“Ez im anê, Mistefa.”

“Mistefê mi...” Deng hat birîn û ji wî alî dengê giriyê hat. Paşê dengên giriyê yên her du aliyan tevlihev bûn. Şeş deqe weke keliyekê derbas bûbûn. Dema Mistefa xatir xwest, diya wî got:

“Çend sal berê birayê te Kamûran hat ku te bibîne. Lê zaliman nehîştibû. Kurê min qet nebe kincên ku min bi Kamûran re şandibûn dane te?”

Mistefa gotibû “erê” ku telefon hat girtin. Bihîstok hêdîka danî cihê wê. Li kincên xwe yên ew çend sal in li ser bûn û peritîbûn nihêrt. Roja ku ew li ser ranzayê belav kiribûn hat bîrê. Û tê derxist ku bêhna ku ji wan dihat, bêhna dayik û gundê wî bû. Milên xwe li ber singê xwe girê da mîna ku tişteke hembêz kiribe, kincên li ser xwe hembêz kir. Xwest bêrîkirina salan hinekî kêmbike û berê xwe da menzela xwe ya biçûk.

23ê avrêlê 2016

*Vê çîrokê di pêşbirka Denîz Firat de xelata sêyemîntiyê girtiye.

Zozan bêbask ma

Yıldız Karagöz

Zozan ji herema ez jê hatibûm bû, hembajarîya min bû. Cara yêkemîn, min ew li bajarê Zurîhê li meşa roja 8ê adarê ya Jinên Dinê dîtibû. Gava ji min re got, “Ev baş e ku meriv bi hembajarîyên xwe re biaxive. Qet nebe tu nikarî ji min re bêjî bawerhişk.” Ez tev li hev bûm. We rojê min dît ku ez di rewşa ku tê da me, ne bitenê me! Kî dizane ku van gotin di guhê çend mîrovan de çingînî bû?

Gava ku min pirsî “gedê te hêne?” min re got, “Na, xwezî habûyana!” ez çiqes poşman bûm ku min vê re gotibû „başê ku gedê te tunen“. Min ji ber gotinên xwe yê bêfikir fedî kir. Min nizanî bû ku ji bo wê bê zarokbûn êşeka mezine. Wê re got; “ tu hîne pir cana. Rojêkê ku tu zevicî gedê te çebivin û îcar tu dikara gedên xwe di hawirdora malbateka germ de mezinbike.“ Dema ku ji min re bahse ameliyata xwe kir min ji fikrên xwe şerm kir, pir fedî kir ji ber gotinên xwe yen bêfikir. Min ji ber dayîkbûna xwe, xwe sûçdar hîs kir. Min ji ber ku ez dayikek bûm nekarî şukurîya xwe bikim. Mînak kêrekê di hundire min re çûbû. Kî dizane ku cane we çiqes diêşî. Xwa-

zika dayîkbûn tişteki were parvekirin bûya.

Xeyalên xwe yê şikeştî, wek tabloyêka bi xemgîn li ser rûyên we daliqandî bûn. çavên we yê mîna du golen bi rengê deryayê, westiya û qediyabûn. Min bê zanîn dest bi birîna we kiribû. Bi gotinên sivik ber xwe da kenîya û mînak qey tişte tek çewt tunebû birîna xwe veşart. Rastiyên xwe jî di çavên xerîb da mîna îrîna kul an di bedenê we da diherikîn. Gava ku dipeyivî, êşên ku diketin navbera rengê rûyên we xûyadikirin. Bêbandor bikeniya jî wê nedikaribû wan êşan jê bibe. Digot, “Dev lê berde! bi vî rengî ji jîyan xweşe.” Êşa ku di dilê wê da hêlûn çêkirî da; kîn, qehr, tinaz, nefret, dev jê berdan tevli hev bûbûn. Jîyana xwe ya dema berê bi kenekî dînan re ser girt. Dema behsa jîyana xwe ya bi êş û agir ku ji bo we biha/bedêl dayîbû dikir, digot; “Avrûpa çavên me vekirin.”

Dema ji bo rojbûna wê, ez çûm mala wê ya li bajarê Baselê, ez li ber deri bi fîstaneke kurdistanî pêşwazîkirim. Dema em derbasî odê bûn fîstanê we yê bi nexşên têyra

tawûs bi kevirên rengîn wek sorik, reşik, zêrînî û zîvînî hatîbû nexşkirin li erdê xûş dibûn. Li hundir carek din got „bixêr hatî.“ Ji enîşkên fistanê wê da heta binî lingan, dawiya fistanê wê valon ên fireh belaweladibûn. Kembera zêrînî ya bi navê xwe ya zirav girêdayî, kûçên wê yên gilover dabûn xuyakirin. Dema birê diçû fistanê bi motîvên kevirên rengîn di bin ronahîya lambê de dibiriqîn û wek mînak têyra tawûs xûya dibû.

Ew di xaniye kî bi du odeyan de tenê dijî. Dema min gava xwe avite hundirê malê min fêhm kir ku ez di hawireka cûda de me. Bi nişkava, min xwe di nav odeyêka biçûk û bi rengên xweşik hatî xemilandin de dît. Li dîwaran ber, xaliçe û heqîbên rengîn û derdorên xwe yên bi morî û mircana û bi rîsên rengîn hatîbûn xemilandin re kêfa min hat. Ew ber, xaliçe û heqîbên rengîn hatîbûn ziman, her yekê çîroka xwe ya cûda eşkeredikirin. Di van çîrokan de, gava ku roj wek sinîyeka sor li ser berîye de dadiket, jinên li hespan sîyarbûbûn wek bayêkî diçûn. Dibe ku ev xewnên dîya wê an jî yên dapîra wê bin ku li ser tevnan zindîbûbûn. Di nav neqîşanda, ew êvînen nig şikestî, ew hewesên ku ji qalikên xwe derneketin hatîbûn

ziman. Ji berî min, çend jinên din jî hatîbûn mala Zozanê. Hevnasîna wan jî ez ji rêwîtîya mistîk derne-xistim. Dema ku ji bo ez rûnim cîh dan min, ez li ser mîndereka bi hirîye hatîbû çekirin û bi neqşên geltan hatîbû neqşkirin de rûniştim. Ew balîfên dîwaran ku min pišta xwe dayîbûn, rûpiştê wan e bi tentene, qirlentên hatin nexşandin bi qenewîç jî dîroka nîfşên cipcûda eşkeredikirin. Min berê xwe dan wan, yek bi yek destê xwe lêdan. Min got, “vana te çekirin?” wê got; „Erê! Min sandoqa cihêzê xwe ji gundê xwe da anîn; yên paş jî li wir man.” Kesera xwe kişand, sîngê xwe parikî. Porê wê yî reş pêl bi pêl li ser singên bedew de belaw bû.

Her çiyes dema me li gund sifra erdê bi ew sênîya baqir ya mezin amadedikir, li vir di nav odeyê de cîhê maseya qehwê girtibû. Bi min, di nav ew qav û qacaxên baqir û zîvînî yên li ser hatin danin ku wek dekor bûn, hilmêk hildiket. Tê bigota dema di zarokatîya me de bîhna ji dûr da dihat ket e pozê min. Wê rojê di vê odeya dêkorîn de, Zozanê ji me re şîvên herema me çekiribûn û li ser sifra erdê dan ber me. Şîvên ku ji me re çekirin gîştîk şîvê ji ber destên dayîka xwe hînkirî bûn. Geva ku min şorbê

meyîrê, qulotik, miqle, zade bilxur, şîranîye qayîsan dixwar, dayîka min li ber çavê min xûya dibû. Min diya xwe car li nav aşxana me ya li gund de didît, car jî li nav aşxana me ya Konyayê. Diya min di aşxana me de li ber dûkêşê beroşa ser disten de şîva me tevdida. Ji aliyê din de bi zibil, sape cê û gênim ar vêdixist. Di aşxana me ye li Konyayê jî li ser ocaxê gazê biroşa şîvê xwe tevdida.

“Hevala min çûyê ku!” ez bi dengê Zozanê veciniqîm. Hevalê me ser sifrê tev li hev kenîn. Zêlo ji Mardînê, Havîn ji Amêdê, Fîdan jî ji Meraşê hatîbûn Swîsrê. Em tev koçbêr bûn li ser sifrê. Min bala xwe de wana, Peyvên gulî yên Ewropayê di rûyên wan de bûn. Min di dilê xwe da got, “kulen dile we jî li ser xetên rûyên we vekirine.” Sohbeta me li ser cûda bûna heremê me bû. Ji me her yekê qala adetên gund û herema xwe dikir. Xwazî ku me cihê kirin, heremparêzî di navbera me de çenekiribûya. Koçberî me davêje ber hemêza hûtê bi heft serîyan ku ji dûr ve mîna agirêkî meşalê vêdikeve. Û hûtî bi heft serîyan, dema ku li hemberî zêdebûna me bi ser neket, em wek nanêkî parî parî, herem herem ji hev bidûr xistibûn. Halbûkî, her yek heremên me ji bo danikî

xwarina vî hûtî bûn. Dîsa jî hîsên me yên di dilê me de dema dibûn yêk, em nezikî hev dikirin, dikişandin ba hev. Wê demê cûdabûn belavdibû.

Gava ku Zozan negêhiştîyê yarê xwe, gunde wê ji wê re tengdibe. Êdî Bêhne wê li cîh û war ê te de hatibû dinê û mezin bûbû dervedikeve. Ji birê xwe re dibê, “min jî bibin Avrûpayê” dema ku hatî Swîsrê hîna 21 salî “bûyê. Wê jî wek birê xwe penaberî (iltica) kiriyê. Fîdanê pirsî, “Tu terê gundê xwe Canbeg ê (Cihanbeyli)?” Zozanê got, “Na! 15 salin ku ez neçûme gundê xwe. Ez dizanim ku gey tiştik wek berê nemayîye. Lê eger ez rojekê herim, ez ê gundiye xwe mal bi mal bigerim, ziyaret bikim. Ezê li ser kolanan û çiyayên gundê xwe seyran bikim bêyî ku ji tîrsa kûçikan bigerim. Piştî wê bala xwe de min û got: “Tu dizanî? dema ku em li gundê me bûn, li me her tiştêk şerm û şermazar bû. Me nedikarî derkevin dervayî hewşê xwe. Li îd anjî dawetan me dikanî derkevin der hewşê me.

Min sohbeta me vegerand û got, “Zozan! birastî em hatin rojbûna te pîroz bikin. Lêbelê Tu tarîxa rojbûyîna xwe rind dizanî?” Wê got, “erê, ez baş dizanim.” Fîdanê çavên xwe bal kirin û got, “rastî! Tu çava

dizani?” Zozanê mîna kesêkî li ser rastiye xwe sekinî xwe lêqand û got, “ roja ku ez hatim dinyayê manga me ya sor mirîye.” Min got, “Çi-ii! korbîyê, heta tu hatî ve dinyê te serê mangê sor xwar.” Em tev li hev kenîn. Êdî me dest bi henekan kirî bû. Zozanê **qandîk** dikanî zikê xwe digirt û di çave wê da hêstirk dihatin xwar. Îcar min got, “roje ku ez hatim dinyê biçer di terlê me de şikeştîyê. Ganimê me 3 rojan li ser erdê maye. Gîştik li ber royê hişk bûye.” Havîn ê got, “ bisekinin, bisekinin! Ez rast dizanim tarixa rojbûna xwe.” Zêlo got, “Erê,! Erê! Ke ca bêje tu çava hatîyê vê dinyayê.” Havînê got, “rastî ez dizanim.” Mereqa me zêde bû. Û me bi hev re got, “ dîya te kêsekî xwandewan bu?” wê got, “na, na, roja ku Kenan Evren asker rakir ser pîyan, ez hatim dinyayê.” Em tev li hev şaş bûn ku bêjin çî? Fîdan ê got, “başê, emê 12 îlonê verin cem te. Lê dil xatirê Kenan Evren ji hêye emê ji vî re jî qewzegulek reş bişînin.” Ken û girî li rûyên me de li hev ketin. Êdî em bi kelegirî dikenîn!

Dema ku Zozan ê li Swîsre cîh û war digire, dile xwe dikeve xortekî. Navê wî xortî Botan bûye. Botan ji bajarê Zozan jê hati nebûye û ew şoreşger bûye. Ji bo rizgarîya gel ê me di nav kar û barê şoreşê de bûye. Bi

cil û bergên xwe yên şoreşgerîyê wek kesekî rêber û ji nav eş û xeyalan we, we xelas bike ketiye jîyana Zozan ê. We, ew ji civanên gundî xwe cûda ditîye. Zozan di bin bandora dîtî, fikr û ramanên wî yên pêşverû de dime. Gava ku qala mafên jinan dike, Zozan xwe li ser nermîya ewran dibîne, kefxwaş dibê. Lêbelê, ji bav û birayên xwe heta niha qet tiştêkî weng nebihîstî bû.

Heta niha mêr ên Zozanê naskirî digotin jin jinbûna xwe, mêr jî mêrbûna xwe bizanê û li hesabê wan nehat jî li hemberî jinan dijar bûne. Zaten li xerîbîya vî welatî de, dema ku bi pîrs û rûyê koçbêrîyê yên wek cemedê de li ber xwe dide; ev gotinen evîndariyê ku Botan jê re bi dengê xwe yî nermik digot, hîsen Zozanê yên cemidîn diheline û li dile wê da gulên evîndariyê vedike. Kesêre xwe kişand û got, “ez mîna pisikêkê ketim hemêza Botan. Min ji wî pir hezkir, min nedikanî bê wî hebim...” Aksesûwarê ku li ser şara xwe de girêdayî, di nav du birûyên reş da dadiket. Rengê aksesûwarê yê kesk bi rengê çavên wê va tev li hev bûbûn. Ew çavên bi girî tiji bûyî, hatîbûn ziman, mînak bêjin “Qal-kirina pir tiştî hêye!” Û di cihekî de disekinîn. Levên xwe dema nefes digirt— berdida bi agirê di hundirê we

de dilerizîn. Dema dengdikir şorên li zimanê we hatibûn pêçandin, şikeştî û bi tirsbûn. Dengê xwe di qirikê de dima.

Bi rihekî safikî singê xwe yê wek deşta Konyayê fireh û tijî simbelên zevîyan li ber Botan vedike. Ji bo demeka kin pê re dilşad dibe. Dema biryara zevacê digirin birayên we qebûl nakin. Dibêjin “Ne ji herema meye. Kî yê, kesekî çawayê ne eşkereye. Nabe!” Lê belê ji dema Zozan hatibû Swîsre pê de her dem dibihîst ku jinên ji herema wan hatin pir qedirbilindin lê mêrên xwe jî bêkêrin. Dema Botan digotiyê “Tu rûne evîna min! Hîro hemû karên malê ezî bikime!” bi gotinên ji bo mêrên herêma xwe hîn zêde bawerdikirîye. Li dawîyê birayên we hemberî biryara wan derkevin jî bi Botan re dizewice.

Lê; hezkirê we ji zewaca wan bi şûnda di demeka kin de, kirasê xwe yê evîndarîyê carek din li xwe nekirîye. Kirasê xwe yê li xwe kirî; ji yên Zozanê li ser merên gundî xwe diyîn hîn zêde pîs û neçê bûne. We demê Zozanê kesitîya evîndarê xwe ya rast ditîye. We jî pênekirîyê rojekê di demeka qet nehat payîn de “Em hevûdu fahm nakin!” gotîye û wek mînak mêrên Avrûpî yên modern hemû karesatên xwe wek

xerebeyekî li şûna xwe cîh tîle tere. Ji jîyana Zozanê hemû tiştên dema berê bi xwe re dibe. Lê li gel her tiştî Zozan difikirîyê û biryara xwe dayê ku, ev qedera min e, eza jîyana xwe pê re derbasbikim. Kirinên Botan yên li paş xwe hîştin ew kiriyê wek xerebeyekî. Dema li ber xwe dide; jinbûyîna xwe û malzaroka xwe ya di bedena xwe de wendadike.

Bedewîya xwe ya hundirê xwe hatî welakirin, jinbûyîna xwe çirbikira jî dilşad nedikir. Dema digot “dilşad im! azad im!” bi rastî baş dizanî ku ne me, ne jî xwe nedikanî bixapîne. Ji bo dilşad be hemû liberxwedayînen we, wek lêdanên firçên wênesazekî di jîyana wê de cîh girtibûn. Rihê jîyana we zû de hatibû kuştin. Lê ya rast dema li gundê xwe bû dolabên we tijî kinç nebûn. Di çente de kertên bankayê û danûstandinê jî tunebûn. Ji bo li kêf û zewqa xwe bigere û daxwazên xwe bi cîh bîne azadiya xwe jî tunebû. Lê, rihe kî xwe yî leqekek, bi kelecana, zindî, xwîn germ û azad hebû. Xeyalên xwe yên meriv nedikanî bigire hebûn. Li vî welatî van hemû ji dest girtibûn û kemasîyên din dabûnê. Ji vê danûstandinê bi şûnda Zozanê nedizanî ku baskên xwe nebûn nedikanî bifire.

12.11.2018, Biel/Bienne– Swîsre

HELBEST

Bêrîvan Keskin

DEMSAL

Ku tu kîjan demsal bî
Bihara min ewe
Ezê werim li şaxên te venişîm
Ne dibêjim zemherî
Ne dibêjim tavî
Ezê werim konê xwe di dilê te de vedim
Ma ne tu bûyî!
Yê ji min re asîmanê xwe vekirî!
Ma ne tu bûyî!
Yê ez ji xulavê afirandî!
Ma ne tu bûyî!
Yê ji êşen min re herşev nobedar!

BES TU VEGERE

Bes tu vegere
Azadîyê bi qelenê te kim
Soz.....
Bes tu vegere
Ezê mala xwe ji asîmanên te bar kim
Lê netirse
Ne sterk im ku te bihêlim sêwî
Ne heyv im ku te bihêlim tarî
Ez hehecik im, jixwe bê war im
Li biharan têm
Li payîzan diçim
Helbet ezê rojekê bimirim
Bes tu vegere
Ezê biharan diyarî te bikim

Di kurmanciya Anatoliya Navîn da

Gotinên çê

- II -

(ŞÎRET, TEME, DUA, HEZJÊKİRÎN, PESÎN, TAW, PAYÊ/PAYÎ DAN)

Nuh Ateş

Di hejmara bîrnebûnê ya 73an da min li ser mijara gotinên neçê nivîsîbû. Di vê hejmarê da jî ezê qala gotinên çê yên ku ji dem û dewranên kuriktiya min li gorê zaravayê (devoka) kurmanciya gundî Xelika (Kulu-Konya) di bîra min da mayî bikim.

Ji hêla zimên û nivîsandinê da kêma yan zêde tesîra zaravayê (devoka) Xelika li ser gotinên neçê yên ku min li jêr komkirî heye. Ji bo ve jî, dibe ku ev şor û gotinên ku di bîra min da mayî bi yên li gund û bajarokên kurd yên din ên li Anatoliya navîn va ji hen aliyên da hevûdu negrin û ji hev cihê bin.

Nivîsandina gotinên çê jî ji bo ziman, kultûr û civatnasîne gerek e. Ji hêlekê da jî, mijar û naverok çî dibe ma bibe, her nivîseke bi kurdî û bi taybetî jî li ser Folklor û zargotinên kurdî li her cîhûwarên kurdnişin bi serî xwe xîret û liberxwedaneke ji bo parastina çand û zimanê kurdî ye.

Peyva çê di kurmanciya me da pir û bi maneyeke rind tê bikaranîn. Bi gotinên çê meriv, bi taybetî zar û zêç li gor tevger û baweriyên civatê yên serdema xwe tîr perwerde û terbiya kirin

Navî li ser e, gotinên çê pir caran tesîreke rind, erênî û bi kêr li ser piçûk û mezinan cihdihêlin. Hen ji wan jî sewa parastin û hacetên duzanê û ideolojîya dewranê bi kêr in.

A

- Aferin
- A Xwedê ku tu heyî/
Çi rind e ku tu heyî
- Avha, Xwedê ne ke

B

- Bi aqilo/aqilê
- Bi heş e/ serî tijî heş e
- Bi heşan kes nagê (nagihê) wî/wê
- Bi her tiştî dizane heta ku
bi binî herdê gihê

- Bi her tiştî dizanê, wekî derya ye
- Bi tevn û teşî ye (Jin ji bo keçîk/ jina tewên)
- Bi şanûshuret e
- Bi gurê(gorê) mezina bike
- Bi kincên piqol megere, eyb e
- Bi xêr û bereket we
- Bi xêr hatî
- Bi xêr herî û warî
- Bi ber dil da çûyîn/
Bi ber dil da here
- Bi pê avê vemexe
- Bi/Ji xwe bi guman we
- Bi bismilahî destpê her
karekî bike

C

- Cêmêro (Camêr), hêyfa te
çî cêmêr e, di ser ra cêmêr tunen
- Colmed (Comerd)/
merikî colmed e

Ç

- Çava (Çavan) bixwim
(bi meneya hezkirinê)
- Çav bi teva nedin
- Çav fere we
- Çê: keçêke/kurekî çê; zevîyên çê,
hespê çê, pezê çê...
- Çî mêr e wekî zêr e! /
Çî jin e weke zêr e!
- Çî mêrî/jine çê ye
- Çî kurikekî/keçêke biaqil e,

- Çî keçêkeke/kurikekî bi heş(hiş)
e, hay je her derê heye
- Çî jineke/mêrekî bi aqil e (bi heş
e) ew î/ew ê bi binî herdê dizanê
- Çûyîna xêrê we, bi xêr herî û bi
xêr warî
- Çî yê/Çî yî jîr e, ji heqe îşa tê
derê (der tê)
- Çapik e/Merikî pir çapik e/ Jin-
eke pir çapik e
- Çî rind e ku tu heyî
- Çavî te ne li nemusê xelkê we
- Çî yî/Çî yê çeleng e
- Çilekîyê me ke
- Çîn û çortana dermexe

D

- Dest û pîyê te nêşin
- Dest û pîyên xwe ba bikî
- Dest fere ye/Jineke/Mêrekî pir
destfere ye
- De çê de çê, min bihîst ku te
xwendina xwe xelas kiriye
- Destî xwe bi ser ra bigre/Destê
xwe bi ser ra girtin(Lê xudî derke-
tin)
- Dilan meêşîna/meşikêne
- Dilşikestîya awenî bike/Awenîya
bide dilşikestîyan
- Derewe me ke
- Dizîyê me ke
- Destdirêjîyê me ke

- Devî xwe ji xêra ra veke
- Dest bi huner ê/Dest bi huner o
- Dest û nigan (lingan) zêr ki:
Çi mêrî/jine çê ye ê ku dest û
nigan zêr kî
- Destê xwe di ber xwe va ke û
li oxirê mêra daweste
(ji bo jina/keçika)
- Derawa me ke
- Di nav heyî da wî
- Derya ye: Wekî derya ye,
pir tiştan dizane
- Doxinê xwe li ber heramiyê
vemeke

E

- Ez ji te hez dikim
- Ez di dorê heta benî gorê
- Ez qurban bi bavûdîyên xwe va
- Ez qurbana işqê çava(çavan)/Ez
qurbana çirê(çireyê) çava
- Ez qurbana hêstêrkên
çava(çavan)
- Ez qurbana xelqê çavan
- Ez qurbana kezewê te
- Ez qurbana herdî (erdî) ku tu pê
lê tenî
- Ez rindîya ku te ji min ra kirî
hetanî mirinîyê ji bîr nakim
- Ezîyet bi heywana me ke

Ê

- Ê di dilî te da biwe îşala
(îşalah)
- Êfa(hêyfa) meriya/ êfa wî,
çi merikî colmed wû
- Êmega/Rindîya ji bîr me ke/
înkâr me ke

F

G

- Gir-gir deng me ke
- Gunehkariye me ke
- Guh pê gotinê neçê va me ke

H

- Heşgihêştiyo
- Hezar salî biwî/bijinî
- Hesûdiyê me ke
- Herê m me xe (me xwe)
- Heqa me xe
- Heqî sêwîya me xe
- Heqî min li te helal be
- Heqî cîrana çav ke (bike)

Î

- Îzika me ke

Û

- Îftera me ke
- Îcadan dermexe

J

- Jineke çê a ji vê biderê
- Ji te pir hez dikim/

- Ji te razî me
- Ji ber mezina rawe ser xwe
- Jîr û jêhatî ye
- Ji şer û beleyan dûr daweste

K

- Kehîl e, di ser wî ra kehîl tune ye
- Kesê ku rindî ji te ra kirî bi ser serî xwe de

L

- Lawî reş o (bi mena jîrî, wêrekî û liserxwebûnîyê tê gotin)
- Li îyd/eyd erefan here destî mezina
- Li dîndarê mezina destûpîyên xwe li ber xwe girêde
- Loma me ke
- Li dunya heq herî cenetê

M

- Malava/Mala te ava be/
Mala te şên be
- Malxurîyê me ke
- Malhila me ke
- Ma tu î li ser xwe wî
- Mêrê dunê (dunyê) derewin e
- Merî çê wo,
di ser ra mêr heram in
- Mêrekî çê ê ji vî biderê/
Jineke çê ji vê bi derê
- Mezin û biçûkîyê çav ke

- Melekayek li pêş û yek jî li paş tewe
- Meqahr e/Ji qahra kete bin bara
- Ma çavî te nî (neyî) li nemûsê xelkê we
- Mexdura şa bike
- Mekeve rû meriya/mekeve rû xelkê
- Meriya xûlî me ke
- Meriya meqahirîne
- Me rûreş me ke
- Me/Xwe meke riswa

N

- Nefsmîr/Nefsmîro/
Ma tu î nefsmîr wî
- Nefsbiçûk we
- Neheqîyan me ke
- Nerîndîya me ke
- Nizxa me ke û çin û çortana der mexe
- Nifira me ke

Q

- Qe neşhîtî
- Qêweta me ke
- Qedir û qimeta bizane
- Qimetê xe (xwe) bizane
- Qirfa bi xelkê me ke
- Qurbana qeretiya te wim

O

- Oxirê mezina mebire/li oxirê mezina daweste, serî xwe di ber xwe ke
- Oxir we, çûyîna xêrê we
- Omdîyê xe (xwe) qet mebirre

P

- Pir yare te me
- Pir bijînî, hezar salî biwî

R

- Rindîya bike
- Rindî û heqa înkâr me ke
- Rehma Xudê lê we, çû dunya heq (di pêy mirîyan va tê gotin)

S

- Serqot megere, eyb e
- Serhevda me ke
- Sûvahatiyan li hev wûne
- Sihêrbazîyê me ke

Ş

- Şorên neçê/xeraw me ke
- Şorê devî xe (xwe) bizane/
Ma te hay je şorê devî xe hewe
- Şorê mezina mebire
- Şora mezine ye
- Şûnê xwe bide kal û pîran
- Şûna te bi cenet we
- Şeg e, di ser wî ra şeg tunen/

- Filan kes bi kawlistine pir şeg e
- Şîrê min li te xaş (xwaş) helal we

T

- Taw dayîn/tawa pê de (pesandin, teşwîq kirin)
- Tijî heş û aqil e
- Tu herî cenetê
- Tu derd û kulan newînî
- Tu tahlîya newînî
- Tu pir bijînî

V

- Vira me ke
- Ma tu ne yî bi eynat wî, vi pîstî xelke me keve û mewe dirikê pîstî xelkê

W

- Wekî/Weke qeda ye
- Wekî/Weke entîkê ye
- Wekî/Weke zêr e
- Wekî/weke kenebar(kehrîbar) e
- Wekî/Weke cin e
(cansivik, qurnaz, jîrûjêhatî)
- Wekî/Weke meleka ye
- Wêreko/Wêrekê Ma tu î/
tu ê wêrek wî
- Wekî/Weke çik e

X

- Xudê (Xwedê) teve îşî
(karî) te we

- Xudê ji te razî we
- Xudê rindîyan bike nesîw
- Xudê ê di dilî te da bike
- Xudê mirazî te wune(bîne) şûnê
- Xudê heş û aqila bi te de
- Xudê îşî te rast wûne(bîne)
- Xudê dil û mirazê te wûne şûnê
- Xudê tu tahlîya nede
- Xudê tu derd û kedera nede
- Xudê emrekî dirêj bike nesîw
- Xudê ji qeza û bela biparêze
- Xudê ji şeran biparêze
- Xudê isleh bike
- Xêra bike
- Xêr e îşallah
- Xerewîya me ke
- Xudê dil û muradê wê
wûne şûnê
- Xudê bi fedîkirin nede
- Xudê ji çavên neçê biparêze

- Xilafîya me ke
- Xagîyan me ke
- Xudê neşeyîtîne
- Xe(xwe) û me riswa me ke
- Xîretkêş we/Xîretî dêûdotan
û mermalîyan bikşîne
- Xwe meke eşoret

Y

- Yare te me/Pir yare te me (bi
meneya hezkirinê/dilketibûnê)

Z

- Zêfan me ke
- Zîyankarîyê me ke
- Zikî merîya meêşîne
- Zema me ke
- Zulimê me ke

Mainz/Alemanya
01.04.2019

ŞIVAN

Klama klasîk a kurdên Anatoliyê bi nav û deng
“LO ŞIVANO” îlhama vê çîrokê ye.

Mûlla Evîndar

Roj çû ava, şewqa xwe wenda bû, şev bi ser zozanê de hat.

Li ber mala axa dengê kûçik hat, kûçik lêket. Axa rabû, li hêla malê gom hebû, li hêla gomê jî pez, berî her tiştî li pêz nêrî, pez mexel bûye. Dengê kûçik hîn dihat. Axa dît ku yek li ber kûçik e, kûçik wî bernade. Axa berve kûçik çû, go “Aşt,aşt!” Kûçik rawestî. Li vê wextê ya mîvan, ya jî diz dihat.

Lê ew ne mîvan bû, ne jî diz. Axê go: “Tu kî yî?”. Go “Ez şivan im xalo, şivanê ecer.”

Axa: “Bi xêr hatî.”

Şivan: “Spas xalo!”

Axa: “Çima ewqas dereng mayî?”

Şivan: “Ez ji xwe re peya hatim.”

Axa: “Gundê we dût e, tu çima peya hatî?”

Şivan: “Heyam xweş bû, her der gil û giya ye, ez hez dikim peya bigerim.”

Axa: “Keremke, were em herin hundir.”

Pezê axa çend roj in bê şivan e, axa gund bi gund gerî û ev şivana

dîbû. Şivanekî por şitil, por dirêj, bejn zirav û 18 salî bû.

Axa derî vekir. Li sirtê / milê Şivên tûrikek hebû, tê de çend kinc, kûpê avê û hwd. Şivên tûrikê xwe da ber derî. Ketin hundir, derbase odeya mîvanan bûn, axa çiraya li dîwêr a bi rûnê gazê vêxist, rûniştin.

Axa bang kir “Keça min çayê bîne”. Xanima axa jî hat odê, bi Şivên re go “Bixêr hatî”, jê pirsî “Ji şiva îşev tu mayî, tu yî birçî yî, ji te re tiştêkî xwarinê hazir bikim”. Şivan go “Na xaltiyê, nan û av di tûrikê min de hebû, spas”.

Keça axa, Cemikê çayanî. Çiraya li dîwêr şewq dida odê, bejn û bala Şivên pê ronî dibû, Cemikê çay li ber Şivên girt, ji çî ye wê jî nizanî, dilê wê kire gurmegurm, kelecaneke lê peyda bû. Ewqas mîvan tên Cemik cara weha nedibû.

Axa: “Li vê zozanê îtibarek min heye, pezê herî pir li vir pezê min e, pezê herî çê li vir pezê min e, tu yî weha bizanî û weha bidomî”.

Şivan: “Lewma ez peya hatim, min go ez deşta vir, çêre pir li ku heye bizanim. Tu meraq meke xalo.”

Axa: “Navê min ne xalo ye.”

Şivan di ber xwe de kenî. Axa jî kenî, go “Ez ne xalê te me, axayê te me”.

Şivan vê carê go “Erê, tu axayê min î xalo.”

Dengê vê sohbetê dihat odeya ku Cemik û diya wê lê. Ew jî keniyar.

Axa: “Tu yî westiya yî, tu yê li berbangê zû pez rakî, rabe rakeve.” Şivan: “Tu rast dibê.”

Axa: “Îşev tu mîvan î, li odeya mîvanan rakeve, sibe tu şivan î, ez jî axa me. Sibe mîvanî bidawî dibe.”

Şivan: “Na, spas! Ez li vir ranekevim. Ez ne mîvan im, ez ê herim li hêla pêz, di kulavê xwe de rakevim.”

Axa rabû ser xwe, go: “Were em herin.”

Hîva li esman xweş dibiriqî, tarîtiya şevê ronî dikir. Çûn li nav pezê ku mexel bûyî geriyar, 500 pez zêde hebû. Her mî mîna ku cûm/ benîşt dicûn dikayîn. Çend kar li nav pez baz didan, dilîzîn. Kûçikê belek û ker li hêla hev bûn, mîna ku ew bêjin; “Em ji sibê re amade

ne” li Şivan dinêrîn. Li hêla gomê odeyeke biçûk hebû. Axa deriyê ode vekir, bi Şivan re go: “Ev odeya te ye”. Axa çira li dîwêr vexist. Li erdê geltek raxistî bû, Şivan tûrikê xwe avêt ser. Li kêleka dîwêr ciyek, li ser cî lihêf û balîv hebû. Xanima axa jî hat, ter / xurca kerê anî wir, go: “Xwarin, vexwarina te ji bo sibê gişk di vir de ye”.

Şivan ji dest girt û spas kir. Esmanê reş li berbangê bi şewqa rojê qeliştî, ronahî bi ser zozanê de hat.

Şivan li pêşiya pezê xwe ye û dihere ber bi mîngên bi gil û giya. Şewq û tîna rojê di pencerê re serçavên Cemikê mist dan, çav lê qemişandin. Ji xewê şiyar bû. Dengê zengilên pêz kete guhê wê. Rabû, hat ber pencerê. Pencere nizm bû, her du henîşkên xwe dan ser dîwarê ber cama pencerê, xwe pê sipart û li der nêrî, li jor şewqa rojê, li jêr keskahiya zozanê xuya dikir. Pez ketibû rêze diçû,

Şivan li pêşiya pêz bû, dilê Cemikê dîsa kut kut avêt. Îro ne mîna rojên din e ji Cemikê re, çima ye ew jî nizane. Kêfê wê pir tune ye.

Ji odeya xwe derneket, diya wê hat ba, lêpirsî, Cemikê go: “Ez bêhal im, ez ê rakevim.” Cemik

21 salî ye, heta van salan ew ti car weha nebûye. Qurifekê ew girt. Di ciyê xwe de çavên xwe berdan tawanê, dest yek li bin serî, yek li ser dil bû. Çavên wê westiyane, lihêf kişand ser xwe û çavên xwe girtin, bi dengêkî nizm, bi dengêkî westiyayî, ji dilê wê nalînek hat, go:

*“Dilo, te ji min xêr e
Canê min da ber kêr e
Jana te rabû ji çi re
Ez ê çi bikim jê re”*

Heta niha wê qet ne klamek, ne jî helbestek gotibû, dilê wê bargiran bû, wek ava çem ev çarîna jê herikî

Wê rokê Cemik ji mal derneket heta êvarê. Êvar bû, dengê zengilan hat. Dengê zengilên pêz mîna bang kirin, mîna dawet kirinê bi wê dihat. Rabû ser xwe derket, pez kom bi kom li dor gomê mexel dibû, axa bi Şivên re deng dikir.

Êxe, Cemik li ber malê dît, bang kir, “Keça min were vir, şivanê me, ji me re kuvank/kuvark anîne”.

Kuvank li hêla Şivên di torbeyê paçinî de bûn, devê torbe vekirî bû. Kuvank bi qasî bostekê gir, reng xweşik, teze xuya dikirin.

Şivên ew li deşta wan deran berhev kiribûn. Şivên torbe heyne û da dest Cemikê, hinek bi fêdî,

hinek serî di ber de lê bi girnijîn û bi awirekî germ û nerm go: “Efiyet be dotmam.” Cemikê nikarî bibêje spas, çima weha bû nizanî, serê wê gēj bû, dilê wê mîna ku ji şûnê leqiya, li wê kêliyê. Cemikê kuvank dan diya xwe. Dîsa çû odeya xwe, ciyê xwe li erdê bû, xwe dirêj kir li ser. Çavên xwe girtin. Li ber çavên wê, awirên Şivên, çavên Şivên, girnijîna wî. Dilê wê de agirek hate dadan. Awirên çavên Şivên wek çarîna helbestekê, wek narîniya hestekê, wek awaza stranekê dilê Cemikê lerizand. Ew çi hal e, cara weha nebû. Nalîneke bédeng hat ji kûrahiya ruhê wê:

*“Dilo ew çi hal e
Te çima nal e nal e
Jana te xweş û delal e
Eceba çima ne zelal e”*

Şîva êvarê kuvank bûn. Ji şîvê şûn de Cemikê bi diya xwe re al nekir/alîkarî nekir, qaw/firaq neşuştin. Zû çû odeya xwe, zû kete ciyê xwe, bi çavên westiyayî raket

Seda /serê sibê bi dengê zengilan Cemik şiyar bû, şewqa rojê ode ronî dikir. Pencere nîv vekirî bû, bayekî xweşik û hênîk tê re dihat. Rabû hat ber pencerê, pez ketiye rêze, hêdî hêdî dihere, Şivan kerê

xwe bar dike, kûziyê xwe tiji av dike. Porê Şivên bi bayê hênik li hewa dilîst, ew porê dirêj bi bayê xweşik şe dibû û di pencerê re li serçavên Cemikê diket.

Cemik serxweş û sermest bû. Rabû derket, berve pêz çû, lê pez bi dûrketibû, Şivan bi dûketibû, dengê zengilan hîn dihat. Ba lêxist û şara wê ji serî firand. Şar berba çû. Kete pê şara xwe, yekî/ê bidîta wî/ê bigota qey ew ketiyê pê pêz.

Şar berve pêz diçû, li neqewê li ser kerengekî dawestî/rawestî. Cemikê şara xwe da serê xwe, li ser neqewê li dûr nêrî, li pezê mala bavê xwe, li şivanê mala bavê xwe.

Pez him diçerîya, him diçû, Şivan jî bi hêla pêz ketibû. Roj hîn teze derketibû, germahiyeke xweşik li zozanê belav dibû, Cemikê li jor li esman nêrî, ewrên spî di nav şînayiyeke zelal, xweşik û ronî de xuya dikirin, li jêr li erdê nêrî, di nav keskahiye de gil û giyayên rengîn di ber çavên Cemikê re derbas bûn. Dîmenên ku li berbangê dîtî: Bejna Şivên, porê Şivên ê ku li hewa dilîstî.

Cemikê çavên xwe heynan, dîsa li pezê mala bavê xwe nêrî, bejna Şivên pir hindik xuya dikir, go:

“Lo Şvano bejna te li dûr e

Janek kete dilê min, kûr e

Qey eşqa min firiye te
Qey dilê min ketiye te”

Bi ser vê çarînê de wê ji xwe re eşqa xwe îtîraf kir, nalîna dil zelal bû ku çî ye.

Vegeriya mal. Diya wê li hêla malê bû. Diya wê bi henek go: “Keçê tu ji ku têtî? Min go qey tu reviyayî.”

Cemikê go: “Ez li vê hewa xweş ji xwe re li dor malê digeriyam, şara min berba çû, ketim pê û min anî”.

Diya wê: “Min go qey Miço tu ji lawikê xwe re rivandî” go û kenîya.

Pir malan Cemik xwestibûn lê Cemikê nekir, yek ji van jî Miço bû. Miço jî axa bû, ji lawikê xwe re Cemik xwestibû lê Cemikê qebûl nekirî bû. Dê û bavê Cemikê pir dixwest ku Cemik bibe bûka Miço

Emsalên Cemikê gişk zewicî bûn, hîn ti keçik heta 21 saliyê li mal nema bûn.

Cemik bi rindiya xwe bi nav û deng e, ew bûye 21 salî, hîn nezewicî ye. Digotin Cemik ne ji merkir/mêrkira ye.

Nîvro bi şûn de dengê çerçî li zozanê hat, li hefte carekê çerçî dihat. Cemik berve çerçî çû, li çerçî gundî civiya bûn. Cemikê her carê kîloyek loqimê bi gwîz distand vê

carê wê jî nizanî çima ye, ji xwe bêxeber du kîlo standin. Herî / hirî da çerçî, loqimê xwe heyne û hat mal.

Li siya dîwêr rûnişt. Dîwar, dîwarê odeya li hêla gomê, dîwarê odeya Şivên bû. Deriyê odeyê vekirî bû, kete hundirê ode, loqimê di destê xwe de bi nivî kir û da hêla balgiyê Şivên. Çû şijing anî, misîn anî, ode av kir, rêş kir û ji ber ku ti kes nebîne ew bi lez ji wir derket.

Hevalên wê bang kirin ku herin ser avê ji xwe re bi jinên ku li wir heriyê dişun re wextê derbas bikin. Cemik nehat, çû odeya xwe. Li ber pencerê rûnişt û li benda êvarê bû, li benda pêz, li benda Şivanê mala bavê xwe.

Êvar bû.

Dengê zengilan, dengê kûçikê belek hatina pêz xeber didan. Cemik derket hêla malê. Dê û bavê wê jî li wir bûn. Şivan di hêla wan re derbas bû, silav da wan. Porê Şivên ji tozê wek porê spî xuya dikir, Cemikê di dilê xwe de go: “Min bi destê xwe porê te bişuşta”

Şivan çû odeya xwe, barê xwe li wir ewirî. Li der, li ber derî bi misîn serçavên xwe şuştin, porê xwe dakişand. Cemikê dît, di dilê xwe de go: “Misînê avê min li te bigirta”.

Şivan hat ba dê û bavê Cemikê, go: “Odeya min paqij bûye, we zehmet kiriye, we tişt daye hêla balgiyê min, spas!”, Ne axa, ne jî xaltiyê tişt fêm nekirin, Cemikê serê xwe kir ber xwe, paşê jî li esman nêrî.

Axê go: “Pez xweş çêrî?”

Şivan: “Erê, xweş çêrî, lê babûsk/ bablîsk rabû, hinek toz hebû”.

Şev bi ser zozanê de hat, Cemik li odeya xwe li ber pencerê li der dinêre, ne dengê, ne jî kesek, şewqa hîvê jî tunebû, xew nakeve çavên wê, li pencereya Şivên nêrî, çira wî dihat.

Çend roj in, bêwext, emrîvakî klamên bêdeng wek nalînek ji dilê wê dibarîne. Dîsa dilê wê keliya û nalî:

“Lo Şvano

Îşe te çi ye li nav pez

Bi diskî were ba min bi lez

Ji wî kulavî hîşk derkeve

Li ser ciyê min î nerm rakeve”

Çawa û çima ew hest bi vî awayî hatin ziman, wê jî nizanî. Careke din li der nêrî, şev kerr û lal bû, di nav bêdengî û tarîtîya şevê de tenê şewqa çiraya Şivên dixuyî, wekî din her kes raketîbû. Hêza dilê wê ew rakir ser pîyan û bi gavên bêdeng

çû der û li ber pencereya Şivên dawestî, kûçikê belek ji hêla pezê ku mexel bûyî hat cem Cemikê, sewa ku kûçik deng dernexe Cemikê stûyê wî mist da û li pencerê xist. Jixwe pencere vekirî bû, Şivan hat ber pencerê, go: “Kî yî tu?”. Hîn ku bersiv nehatiyê, Şivên nas kir.

Şivan: “Dotmam, tu yî”

Cemik: “Erê, pismamê mino, ez im.”

Şivan: “Tişteki bi te lazim heye?”

Cemik: “Na, spas! Xew nekete çavên min, çiraya te dihat, min go ka tu çi dikî.”

Şivên nikarî bersivê bide, serê xwe kir ber xwe.

Cemik: “Tişteki bi te lazim heye?”

Şivan: “Na, spas dotmam!”

Cemik: “Odeya te min paqij kiribû, loqim min ji te re anî bû”

Bi fêdiyeke veşartî Şivên go: “Spas dotmam!”

Cemik: “Şeva te xweş be!”

Şivan: “Şeva te jî xweş be dotmam!” Cemik çû odeya xwe. Bi ser vê dîtî û sohbetê de rehet bû, barê li ser wê sivik bû. Lê agirê ku li dilê wê hatiyî dadan hîn xurt bû. Kete ciyê xwe, çavên xwe girtin, ji dilê wê mîna ava çem dîsa çarînek herikî, go:

*“Ji min re bûyî wek şekir
Ez hatim, te derî venekir
Min dilê xwe ji te re vekir
Ez çi bikim te ferq nekir.”*

Diya wê behsa dengbêjan diki-ribû, bi ser vê çarîne de go: “Qey ez bûme dengbêj”. Paşê jî go: “Na, na. Ez ne dengbêj im, ez aşiq im.”

Li berbangê Cemik dîsa bi çûna pez hesiya, dilê wê xwe mîna seetê eyar kiribû, Şivan li kîjan wextê dihere û tê dizanî. Rabû ber pencerê, dît ku Şivan haziriya xwe dike. Li firehî û keskahiya zozanê nêrî û bi dengêki nizm dest bi klamê kir:

*“Min go lo Şvano kerî xwe bar ke
Lo Şvano kûzî xwe tiji avê sar ke
Min go bane kûçikê belek ke
Li dawiya malan li min gudar ke
De here lo lo, lo Şvano
Sal biçûko, dil nizano
De here lo lo, lo Şvano
Canê Cemikê bi qurbano”*

Germa havînê diqijilîne. Îdî bi nîvro pez dihat ser malê, şîrê pezê zozanê xweş e, ji bo ku pez bidoşin, pez didan bêriyê, mêran serî pêz digirtin, jinan jî didotin. Her ku mî tê dotin gan/guhan jî sivik dibûn.

Şivan li pê bêriyê dawestiyê, serê pêz digirê, Cemik û diya wê jî didoşin.

Şivan li ber tav û tîna rojê tiji xwi / xwê bûye. Şivên serê miyê girtiye Cemik jî didoşe, şîr dikete helkeyê bi dengêkî xweşik, Cemikê heniya xwe bi ganê miyê / guhanê miyê helpisart / sipart û di dilê xwe de dîsa dest bi klamê kir:

*“Şivan dameste li pê bêriyê
Lo lo li min megire vê miyê
Were rûne li vê siyê
Ma neçilken çilke xwiyê
Here lo lo, lo Şvano
Sal biçûko, dil nizano
De here lo lo, lo Şvano
Canê Cemikê bi qurbano”*

Diya Cemikê bang kir “Bese keçê, bese! Te ganê miyê ziwa kirin, ti şîr nayê, hîn çi didoşî”.

Cemik ji xwe derbas bûye, ne şîr, ne helke nedîtibû.

Bêrî, şîr dotin bi dawî bû. Cemikê helkeya şîr bir aşxanê, li wir di parzingê re derbas kir û parizand.

Li germa havînê aşxane hênik bû, pencereya xwe li barêz/bakûr bû, bayekê xweş û hênik tê re dihat, Cemikê heniya xwe da ber pencerê li der nêrî, Şivan pez kom dikir, ji xwiyê ew şil bûye, kincên wî gişk

qelêr bûne. Cemikê kesereke kûr kişand, strand:

*“Pezê şivên pezekî çe têr e.
Min go yaqa Şivên gî qelêr e.
Bi şev bişum avê sar e.
Bi ro bişum e bènê bi yar e.
De here lo lo, lo Şvano
Sal biçûko, dil nizano
De here lo lo, lo Şvano
Canê Cemikê bi qurbano.”*

Diya Cemikê kete hundir, go: “Dengê te çiqes xweş e, keçê! Ew klama kê ye?”

Cemikê biska porê xwe guvişand, go: “Qet, min ji xwe re pile, pile.”

Cemikê zanî ku îdî ew ji ber eşqa xwe bûye klambêj. Ber êvarê Cemik û hevalên wê çûn ser avê. Li wir erx, bîr hene. Keçikan li wir lingê xwe dikirin avê, sohbet dikirin, dilîstin. Hîn ku êvar nehatiye keçikan gotin: “Bese em herin”. Xwe dan hêla hev hêdî hêdî diçûn. Cemikê dît ku li dûr keriyek berve avê tê, wê di pîrbûna pêz, şikla pêz re zanî ku pezê wan e. Her kerî hîn ku nehatiye ser malê, berê diçû ser avê, av vedixwar û jê bi şûn de dihat ser malê. Cemikê xwe giran kir, li paşîya hevalên xwe ma, bi hevalên xwe re go: “Hûn

herin, ez ê ji xwe re hêdî hêdî bi tenê werim.” Hevalan jê tiştêk fam nekirin, israr jî nekirin û çûn, wenda bûn.

Cemik vegeriya, hat ser bîrê. Li benda Şivên dawestî. Ne şivanekî din, ne keriyekî din, ne jî kesekî din hebû.

Şivên ferq kir ku li ser bîrê keçikek bi tenê dawestîye. Pez li ser avê civiya av vedixwar. Şivan berve bîrê çû, çi ye, kî ye meraq kir. Nêzîkê bû, dît ku Cemik e.

Şivên cênika xwe xurand, hinek bi meraq, hinek bi fêdî got; “Dotmam çi bû? Li vir çi dikî? Li benda kê yî?”

Cemikê bi kenekî bi dizkî lê, ji xwe bawer, go: “Ez li benda te bûm.”

Evîni eger evîn e, di nav de cesaret jî heye, ew bêcesaret nabe. Ji dilê Cemikê her dem, her wext wek dilopên baranê klam jê dibarîne, ew ê çima evîna xwe veşêre! Nêzîkê Şivên bû, go: “Tu li gundê xwe zewicî yî? Yan jî dergîst / destgirtiya te heye? Her çiqes ku salên te biçûk xuya bibin jî, min meraq kir.”

Şivan: “Na, dotmam. Ez nezewicî me, dergîsta min jî tune ye.”

Cemik: “Mîna min î.”

Şivan bi lez rabû berve pêz çû, Cemikê zanî ku ew fêdî dike.

Cemikê şara xwe ji serê xwe xist. Bisk bi ser çavê wê de hatibû, bi wî awayê çû hêla Şivan, go: “Ji roka pêşiyê de te eşqek li min peyda kir. Çend malan ez xwestim xwîna min nekelî ser. Tu bi min qayîl nabî?”

Cemik bi biska ku bi ser çêv de hatî dilîst. Şivên li por, li biska Cemikê nêrî, dilê wî de agir û pêt çêbû, lê wî bi xuya kirin neda, go: “Ez şivan im, tu keçîka axa yî dotmam!” Pê re serê xwe kir ber xwe, go: “Çiqes germ e!” Cemikê ji xwe bêxeber, bi însiyakekê, moriya îşligê xwe yek vekir, go “Erê pir germ e.” Şivên serê xwe heyna, qefesa wê ya spî, kokên pêşîrên wê yên teze mîna ku li benda yekî bin dawestî bûn. Şivan dîsa serê xwe kir ber xwe, bi lez rabû, go: “Wext jî dereng bûye, ez pêz tope ser hev bikim.”

Cemik: “Erê, dereng e, ez jî herim. Bi xatirê te!”

Şivan: “Oxir be dotmam.”

Cemikê dev da zozanê, çû. Bi ser vê dîmen û demê de ew hîn pir sivik bû, evîna xwe ya Şivên ji wî re aşkere kiribû. Jê bi şûn de wê jî nedizanî çi bibe. Li esman nêrî, çiqes fireh bû. Evîna wê jî mîna esman bêdawî bû, lê difirî, li nav firehî û şîneyiya esman wenda

dibû. Ji ber ku ew bitenê ye, bi dengê bilind dîsa destpê kir:

*“Şivan tu hatî ser bîre te deng nekir
Min sîng berê xwe li ber te vekir
Te şa nekir, li min mes nekir
Cute memike min ges nekir
De here lo lo, lo Şvano
Sal biçûko, dil nizanano
De here lo lo, lo Şvano
Canê Cemikê bi qurbano”*

Cemik hate mal, êvar bû. Pez jî hate ser malê. Şivan û bavê Cemikê bi hev re deng dikirin, vê carê hinek dirêj ajot deng kirina wan.

Li şîva êvarê, li ser sifre axa go “Şivanê me yê here, dest berde ji kar, heta heftekî.”

Aveke sar bi canê Cemikê de hat, Cemikê fam kir çima dihere, go: “Çima bavo?”

Bavê go: “Ez nizanîm çima ye, şivanekî weha pak, jîr ez nabînim.”

Nan xwarina wan bidawî bû, diya Cemikê go: “Cemik tu sifre berhevke ez ê herim ba Şivên, pê re deng bikim.”

Diya Cemikê bi xebereke xweş hat, go: “Min Şivan îqna kir, heta şeş mehan nare.”

Cemik û bavê wê pir kêfxweş bûn. Dem dema raketinê bû,

Cemik berî ku têkeve ciyê xwe di pencereya xwe re li pencereya Şivên nêrî, di dilê xwe de go: “Tu çima ji eşqa min tirsîyî Şivan, çima!”

Ji ber ku Şivan şeş meh din bime Cemik dîsa jî xweş raket. Vê carê li berbangê Cemik bi dengê zengilan ji xew ranebû, dema ku ew şiyar bû pez, Şivan ji zû va çûye qir. Çû li ser neqewê dawestî, neqewa ku li hêla malê. Li wir li dûr nêrî, çavên xwe li dûr gerandin, ne pez, ne jî Şivan xuya dikir, destê xwe da bin guhê xwe destpê kir:

“Min go seda rawûm vi qir ketim.

Gundo ez vi pê eşqa Şivên ketim.

Gotin Şivan î

ji mala bavî te re şeş meh din bime

Şevka du bişev tîr raketim

De here lo lo, lo Şvano

Sal biçûko, dil nizanano

De here lo lo, lo Şvano

Canê Cemikê bi qurbano”

Wê rokê heval hatin ba Cemikê gotin em herin qirşa. Keçik ji mal dûr diketin, qirş berhev dikirin û dikirin şijing. Cemik jî çû. Ji mal dûr ketin, qirş berhev dikirin. Nêzike keriyekî bûn. Pezê malê Cemikê bû. Pez xweş diçere, Şivan li kêleka pêz, li siya giyayekî bilind raketîye. Cemikê bi hevalên xwe re

go: “Werin em ji vir dûr bibin, pez û şivên eciz nekin”.

Ji wir çûn. Wekî her tim, keçikan ji xwe re yek bi yek, dor bi dor klam digotin, diçûn. Dor dora Cemikê bû, Cemikê heyna zirêve / strand:

*“Haye şivan haye, şivan haye
Peze xwe diçere li nav gil giya ye
Şivan di xew da ma ye
Ramekin î westiya ye
De here lo lo, lo Şvano
Sal biçûko, dil nizanò
De here lo lo, lo Şvano
Canê Cemikê bi qurbano”*

Hevalên Cemikê şaş û mat man, li devê wê dinêrin, guhdarî dikirin. Cemikê dewam kir:

*“Weng e Şivan weng e,
Şivan weng e
Gil giya li dor te reng bi reng e
Klama eşqa min
çima bi diskî vèdeng e
Ro çû ava pir dereng e
De here lo lo, lo Şvano
Sal biçûko, dil nizanò
De here lo lo, lo Şvano
Canê Cemikê bi qurbano”*

Keçikan her tişt fam kir. Vege-riyan mal.

Dora din a ro ji sibehê de kete nav xelkê zozanê, belav bû, gotin “Dilê Cemikê di şivên de ye, aşiq e, evîndar e. Keçika axa eşqa xwe firiye şivanê xwe.”

Zozan diçeliqî ji gili û gotinan. Diya Cemikê, bavê Cemikê û her kesî bihîst. Seda/Sibehê Cemik ji xewê şiyar bû, dît ku pez li mal e. Şivan çûye, bejna wî, awirên wî, girnijîna wî ya bi fêdî wenda bûne

Pez bi serê xwe çû neqewa li hêla malê û bêşivan diçeriyar. Cemik çû cem pez, bêtirs strand:

*“Min go pezê Şivên li neqew e
Di dor ra çex diwime mîna kew e
Min go ji şivanî xwe bittir ti kesî
Li ser sîngî xe nakime xewê
De here lo lo, lo Şvano
Sal biçûko, dil nizanò
De here lo lo, lo Şvano
Canê Cemikê bi qurbano”*

Cemikê li esman nêrî, roj dibiriqî, şewqa rojê çavên wê qemişandin, tîna rojê canê wê mist da. Evîna wê, klamên wê mîna şewq û tîna rojê, mîna ronahiya rojê bi ser hemû zozan û gundên wan deran de hat û belav bûn.

Agirê vejîne

keda xwêdana eniya
kedkaran
êşa kul û birînên nehatî
kewandin
sebira pelweşiyayî
kaniya bêrîkirinên
miçiqî
bêxewiya şevistanên
dilteng
xewnên mişext bûyîn
dê bibin agirê roja vejînê
xemgîniyên rojên stewr
çirûskên stêrka asîmana
xemkêş
berfînên quntara çiyayên
stûxwar
xilmaşiya tava serê sibehê
dê bibin agirê roja vejînê
xwîna ji çavên dayikan
diniqutin
hêviya salên derengmayî
tovên gulgenimên
hişk bûyînî
wêneyên albûma bîranînên
rengmirî
dê bibin agirê roja vejînê
dîwarê hestên herifi
keştiya wijdanên
serûbin bûyî
temenê

Xizan Şîlan

li nav bagera keservedanan
bihûrî
giyanên bedenên li ber sermayê
dicirifin
dê bibin agirê roja vejînê
mêjiyê li nav toza gumanan
kelkela eşqa di nava min de
sar bûyî
îskeîska gewriya zarokên
tî û birçî
qêrîn û hawara malbatên
ji cîhwarên xwe dûrketî
bextewariya stûnqelişî
şadiyên li quncikên تنها
sêwî mayîn
têlên tembûra dengxweş
dê bibin agirê roja vejînê
reşewrên bi hêrs mirinê
dibarînin
hesreta li xerîbistana xopan
dinale
bejna keç û bûkên bi reşgirêdanê
hatî pêçandin
kêlên goristana cangoriyên
nemir
kelemçeya zendê ramanên
qedexe
sêdarên heyama pûşt
şîretên Mîrê mîran
ên serî netewandî
dê bibin agirê roja vejînê

Jîyan jan e

Sewda dilşevitî
Evîn bîrindar
Helbest diljar e
Peyv dilşikestî ne
Di hevoka helbestê de
Cih û rêzê nagirin e
Li vî bajarî
Jîyan jan e

Hêvî bêkes
Xevn û xeyal
Bi nîvi mane
Helbest nizane
Bi kîjan peyvan
Bi kîjan zimanî
Hawar û nalînan
Binîvsîne
Li vî bajarî
Jîyan jan e

Were
Em herin zozana
Guh bidinî stranên şivana
Jîyan e
Dengê billûra wana
Bajar bihelin bi êş û jan a

Mem Xelîkan

"Hesp çêkir"

Mûlla Evîndar

Husîn xortekî 19 salî ye, li zozaneke pir xweşik e. Hespêkî wî heye, ew jê pir hez dike. Seda (serê sibe) dema ku Husîn ji xewê şiyar dibe berê her tiştî hespê xwe av dide, gil û giyayê ku ji nav zeviyan berhev kirî dide ber.

Rokê Husîn dîsa ji xew radibe, dihere ku hespê xwe av, gil û giya bidê, vê carê hespê xwe nabîne, ew dibe pariyek nan.

Li nav zozanê gom bi gom, xanî bi xanî, gav bi gav lêdigere lê nabîne.

Hinek ji zozana wan dûr zozaneke din hebû, li germa havînê Husîn dev da wir, peya kete rê, ku li wir jî li hespê xwe bigere.

Dema ku ew tê wê derê, li perê zozanê li siya xaniyekî hespê xwe dibîne. Pir kêfxweş dibe.

Husîn nêzike siya xêni dibe, li hundirê xêni li ber pencere keçikekê dibîne. Keçikê li derva dinêrî, li keskahiya mêrga zozanê, li şinayiya esman û li hesp. Li salên Husîn bû, navê xwe Berîvan bû. Çavên Bêrîvanê ji xwe bêxeber li çavên Husîn, li bejna Husîn dikevin. Çavên Husîn jî li çavên Bêrîvanê dikevin. Bêrîvan fedî dike, bilez ji

ber pencere dihere. Husîn li hespê xwe siwar dibe û dihere.

Çavên Bêrîvanê, awirên wê her wext li ber wî bûn.

Dora din a rojê Husîn seda ji xewê radibe, dîsa hespê xwe nabîne. Vê carê ew rehet e, kelecana, teleşe tune ye, ji nanê xuriniyê şun de radibe derdikeve ku li hespê xwe bigere.

Vê carê ew ne li nav zozanê, ne jî li mêrga derdora zozanê li hesp digere, ew dîrekt ber bi zozana din, ber bi zozana Bêrîvanê dihere. Li rê di serê wî de çav û awirên Berîvanê.

Li ser riya wî çemekê zirav û biçûk hebû, li ava çem destên xwe, ruyên xwe dişo. Di ava zelal de bejna wî, serçavên wî xuya dibû, Husîn yekî por dirêj bû, li ber ava zelal bi destê xwe perçema xwe şe dike, biska ku ji por dewistî dûz dike. Wî li çem ti cara weha nekiribû.

Husîn tê zozana Bêrîvanê. Dibîne ku hesp dîsa hatiye siya xaniyê Bêrîvanê. Vê carê dibîne ku gil û giyayê rengîn li ber hesp e û hesp dixwe. Bêrîvanê jî nizanî çima ye, vê carê dema ku hesp dît gil û giya dabû ber.

Husîn vê carê Bêrîvanê nabîne. Li hespê xwe siwar dibe û di ber mala Bêrîvanê re hêdî hêdî dihere. Ew dibîne ku xaltiyek li ber malê heriyê çê dike, dibê "Xaltî li qûsûra min mêze mekin, hespê min heta vê derê hatiye û li siya xaniyê we mexel bûye, ez hatim ku bibim".

Xaltî dibê "Erê kurê min, duh jî li vir bû, heywan e, ne sûcek e".

Husîn dibê "Xaltî ez tî bûm, avake sar heye?".

Xaltî bang dike "Bêrîvan avake sar ji kûp bîne, rêwiyek hatiye ber derê me!"

Bêrîvan tasek av tîne, dibîne ku dîsa ew xorta ye, serê xwe dike ber xwe, di bin çavan re lêdinêre, Husîn jî di bin çavan re li wê dinêre.

Tasa avê dirêje Husîn dike, Husîn ji ser hesp xwar va tê, tasa avê ji dest Bêrîvanê digire. Bêrîvan li benda tasê li pey dadiweste. Edet weha bû, heta ku mîvan avê yan jî dew bi vexwarinê xelas dike, li bendê dawestîna hurmet e.

Husîn ji hêlekê de av vedixwar, jî hêlekê de jî di bin çavan re li Bêrîvanê dinêrî. Ava ku Husîn vedixwarî difire keziyê, bi hêrs dikuxe.

Dengê Xaltiyê tê: "Helal, helal".

Dema ku tiştê difire keziyê weha digotin.

Husîn avê bi dawî dike, çavên xwe dike çavên Bêrîvanê û tasê dide wê, dibê: "Spas dotmam".

Bêrîvanê serê di ber de, dibê: "Efiyet be pismam".

Husîn dihere mala xwe.

Bejna Bêrîvanê, çavên Bêrîvanê, awirên wê her wext di serê wî de bûn, wan agirek li dilê Husîn dadan.

Li roja sisiya dîsa hesp tunebû û dîsa li siya mala Bêrîvanê bû. Bêrîvanê dîsa gil û giyayê rengîn dabû ber hesp, vê carê av jî dabû ber.

Çend roj, çend hefte derbas dibin, çûna hesp a siya mala Bêrîvanê jî pir dibû.

Bi vî awayî Husîn û Bêrîvanê hev rind nas kirin, dilê xwe dikevin hev, ji hev hez dikin.

Dî û bavê Husîn, Bêrîvanê ji Husîn re dixwazin. Mezinên wan dibên "qedere ew" û ji bo zewacê nîşana wan dikin.

Edet e, dema ku yek nîşana xwe, zewaca xwe dike, ji vir, ji wir de pirs dikin dibên "Kê ew îşê xêre kir?", "Ew zewaca bi destê kê bû?", "Kê navbera wan kir?", "Kê ew çêkir?"

Husîn û Bêrîvan dibên:

"Hesp çêkir".

Ji bo bîranîna komkujîya Helebçê

Geli min nasekinînê ew birîna Halepçê
Ne efsanek e, ne jî çirokek
Agirekî venamir e
Dişewite, dipite, di dilê perçem perçem da
Bihara sala heştî heştan bû
Di erdê da giya, hêşin hêşin dipişikiya
Pelçûma darên hinara, erd dixemilandin
Ji aliyeki, li aliyeki civika stran dibijandin
Hesp tê da çargav dimeşiyar
Û bihar bi erdê ra dikeniya li Helebçê
Ji nişkava da bêhemd terpilî hespê min
Ez ketim ber siya ewrên sor
Paşê jî bayekî asi û xayîn hat
Ber bahî bêketin defter û pirtikên zarokan
Meşîn zarok, ber bihna sêwa
Qirîyan, naliyan û gotin xwe megîne dayikê
Çavên me dişewitin
Nefese me teng dibe
Cigera me tê girtin
Û bedenê xwe avêtin nav ava sar
Şewitî bedenên wan û bûn xalî
Avêtin xaliya wan, deştên dur
Bila carek din hêşin nebin
Ah ew gelî min nasekinînê ew birîna Halepçê
Ne efsanek e, ne jî çirokek
Agirekî venamir e
Dişewite, dipite, di dilê perçem perçem da

Ibrahim Korkmaz

Pêkenok

Hızır Akbina

Hevalên hêja, pêkenokên me di navberê civatê de mane Tu kesî ewna berhev nekirine, tesnîf nekirine Eger tişteki veng bikirina kê dizanî ka çend Nasreddin Xoce û Têmelê me hebûn Belkî jî, pêkenokên me jî çûn tev li yê Nasreddin Xoce û Têmel bûn, li ser besawî wan tên gotin Wê demê, tu kesên me mîna Nasreddin Xoce û Têmel nehatin bellikirin Halbûki, li nav gundekî çexbe, merî bi spontanî rastê kê were yê heft pêkenokan binivîsîne.

Ez rojekê çûm gund, zîyareta Etikê.

Eta min Gula Xêlîl hat em rûniştin.

Torinê xwe Zafer jê re got:

– Etê dibêne ku Gula Xêlîl miriye.

Etik çexê bûke bû.

– Fûnda yawrim, em seda tev li hev ranebûnî? Bûkê got:

– Ji wan pirske. Zafer got:

– Tu ji rabûnê bi şunda mirî. Etê veng li wan mezkir.

– Lê hûn jî li virin! Zafer got:

– Tu çûyî ketî bin metîla xwe, heta ku mêrik! te bibîne em gîştik komkirinî anîn!

– Wax li minê, em ê niha çir bikinî?

– Etê, ez bi tişteki naşewtime, lê gundîya du me da gotinê ku, dendar çû!

– Denê çi yê? Min nimeja xwe kir, rojîya xwe gî girt.

– Na na, ne denê weng e! Ji bo wê haqî te li ser wan da here, tu dendar nabî. Ew denê av û ya eletîrkê.

– Lê em ê niha çir bikinî?

– Pere li ba te hene xerê, jê ra bişîninî.

– Ez nadim perê kefenê min in, tu nabinî em gîyê bi pîcama hatinî.

– Etê tu li wir herî bazarê, tu li ku xerçkî? Bîne pera bi xoce de, ma bi-de dêna.

– Ez nadim, hûn gî çirbûna, ez jî wer bim.

– De etê tu dizanî!

Paşê, etê kesereka kûr kişand. Çû çikinek pere anî, me perê av û eletîrkê jê heyran û dan dêna. Xoce got;

– Etê, rabe ser-çavên xwe bişo, tişt bi we nat, eletîrk birîbûn, ez hatim perê we heynim.

– Niha em namirinî?

– Na na metirse.

Etê tizbiya xwe avêt suh xwe, çû ser nimejê.

QUTO

Seyfî Dogan

Zûda ye ku ez î ji sitila şîra japonîyê ku bi navî Haïku ye hazdikime û li ser kar dikime. Form û navaroka Haiku hîtebacan û ruhî min dike.

Bi kurmancî dibêjên "ê qutê xweş e". Ez jî ji gotin, ditîn û ji fikrên kin haz dikim. Qisên dirêj piştî demekê tamsarkî dibin û zorê didin hafiza merîya.

Ez jî şorê dirêj nekim û hîng ku ji tîrêjê derneketime werim ser êsasîyê.

Haiku mana xwe bi kurdî rêzên kêfxweş in. Haiku qut in lê manê wanan kur in. Haiku kaîde û kuralên xwe hene. Ji sê rezan pêk tîn û kîteyê wê 5-7-5.

Navarokê xwe;

Demsal û xweza ye.

Dem in

Buyêrên li ber cavan dibine

Lîstîka zêkayê

Hîsên dil û mêjo ne.

Prensibên Haïku;

Rêzên Haïku xwe dubara nekin.

Herdu rêzên peşîyê peyvendîyên

xwe bi hevdu ra hene lê yê sisîya ne pewîste ku peyvendîya xwe bi herdu yên din re hebe.

Îro prênsîp, navarok û formê Haïku gelek hatine guherandin.

Edî Haïku serbest tîn nivîsandin lê, sê rêzên wê wek berê ne. Kîte him qut him direj tîn nivîsandin.

Min xwe ji kêtîyê Haïku azad kir lê li ber xwe didime ku sadîka Haïkuyê klasik biminîm. Lê qanûna evolîsyonê heye. Dîyalêktîk heye. Tu dezgeh, tu zindî, tu fikir, tu tişt wek berê namê. Hertîşt tê guherandin.

Min Haïku ji xwe kirin şewq û xezîne.

Min helbestên xwe yên kin navê QUTO lêna.

Helbestvanê sitîla haïkuyî bi nav û deng Matsua Basho ye. Bi Forma haiku şîr nivîsandin wî cemerî dest pêkirîye.

Helbesta xwe yê terî navdar ev e;

hawiz

beq

culp

Quto

baran barî
xêni dilop kir
şip şip

rojê herdem
bi tene ye
germ û ronî

sîhên kin
rîyên dirêj
zevîyên zer

bayî li friskîyê texê
ziravekî kur
legleg firî

rojê li ber ava ye
dengê kilamekê i tê
refek gogircîn firîya

li ser zimanî germ
dem dirêj bû
stêrkek helîya

şerabê kîtêb
bê zehmet vekir
leylanakê bê dawî

kecika bi kezî
gulîyên xwe yên kej
da ber bayî berbangê

derî vebû
hewa teze keta hundir
mêşan ruyên xwe guherandin

Seyfî Dogan



Mon amour Xelika

mon amour

xelika

mere tu dere bendi min bipê
ma roj malê germ û agir jî ronî bike
warên tarî vemrîne
ez î tême
em ê xevnên xwe teze kin
serkot hêstirkan temaşa kin
pêxas axê ramûsin
em ê tamê ji baxşên jîyanê derxin
û bibêjin mala te ava be
mon amour

xelika

mere tu dere
ez î bi te fireh û dilxweş dibime
li ba te mejoyî min î pêl û pêl gulan vedike
û pêtiyen serî minê şên dibin
bi te can û ruhi min î li deşt û banîya digere
û têsêliya pêyda dike
mon amour

xelika

mere tu dera ez qurban
bendi min bipê

Seyfî Dogan

Îsak

Seyfî Dogan

îsak îsak rakeve rakeve
kerîye xwe yî mezman
berve fêzê morik di rezê ke
li bewrerî fêzê mexel ke
ji xwe re li hemê mûskê xe
barî kerê xwe bêwrîne
kilavî xwe li ser axê nerm rêxa
semerî kerê ji xwe re bi balgike
îsak îsak rakeve rakeve
bizbênê xwe qut girêde
şev yek e diz hezar e
dêlegurê biharê êy har e
îsak îsak rakeve rakeve
tu heseba meke
ji xwe re hêstirkan bêmjêre
û ezmên temaşake
îsak îsak rakeve rakeve



AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di **Bîrnebûnê** de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlemediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

Çend peyv û gotinên me

- 1 -

Mehtab Îdelî

A

Açki/î: ronahî, ronî (aydınlık)

Al: kabûs, mêrdezime, pûç bûn (kabus, karabasan)

Alos/Alosî: çaplûs, şelaf/xweşekî, şelafî (yağcı, yağcılık)

An: dapîr (baba anne, anne anne)

Anadut: melêv (yaba)

Ara bûyîn: ewiqîn, gêzirîn, dereng bûn((oyalanmak)

Aravtin: palavtin, parzûn kirin (süzme, süzülme)

Areng kirin: boyax kirin (boya ile süsleme)

Areng: boyax (ji bo pêz) (koyunlara sürülen boya)

Arkilandin: mijûlkirin, ewiqandin (meşgul etmek, oyalanmak)

Asrî/Asirî/Esirî/Esirî: civak/bilind-êmeye, kibar, modern, hevdem (sosyetik, kibar, modern, çağdaş)

Asûn/Hesin: hesinekî bi taybetî yê ku ji bo agir vêxistinê (pîşo ve çakmak taşı ile birlikte ateş yakmak için kullanılan demir/çelik parçası)

Aşne: Xeber lê hebûn (haberi olmak, haberdar olmak)

Atik, Anik, Ayik: dê, dayik, dayektî, dêyatî (anne)

Ava malkî: ava sar û germ (ılık su)

Ava şêling: şêlavk (bulanık su)

Awnî/Awênî: teselî kirin, semax kirin, tav dan (teselli etmek)

Axz/Axiz: alî, hêl, layen (taraf, yan)

Azci: mêvanên ji bo serxwaşiyê tên malê şînê (başsağına gelen misafir)

B

Bades kirin: bi cencere (moşe) di ser genim an jî ceh re diçe, ji bo libên genim ji pûşê wê derkevin. (düvenle sapla taneyi birbirinden ayırma işlemi)

Bajar 1): şehir.

Bajar 2): bazar, bazar kirin (yıllık, yada nişan ve düğünler için yapılan toplu kılık kıyafet alışverişi)

Bapsîg: bablîsok (bora, kuvvetli fırtına)

Batik: hesk (kepçe)

Bazara/Bizarê wê/wî/wan/filankasî: kawdî wê/wî/wan/filankasî, wekî wî/wê/

wan got (onun dediği gibi, onun diliyle)

Beranê kel: beranê bi strû (boynuzlu koç)

Beranê kol: beranê bê strû (boynuzsuz koç)

Berebcî/Berbici: xêl, xêlî, berbû (gelin alayı)

Bergîn/i: pêşwazî (karşılama)

Berxa virinî: berxek (yeni doğmuş/birkaç haftalık emekleyen kuzu)

Berzaqî/Berênî: rûgirtî, bêedebî (şımarıklık)

Berve kirin: kepek derxistin bwbulxur (birşeyin kepeğini çıkartma bulgur vb.)

Bê nemaz isûrî: jê re li bahaneyan gerîn (bahane bulma, laf çevirme)

Bibarbûn: ducanî, duğîhanî (hamilelik)

Bîhngenî: bokenge (kokarca)

Bijmar/Jaj: şehê mêr, şehmar, dulge (kırkayak)

Bîlîv/bîvil: firn, firnik (burun delikleri)

Birek (birek pez): beşek (bir kısım, bir bölüm)

Biskbirî: beşikkertme (beşikkertme)

Bist/bust: gustîlka nîşanê (nişan yüzüğü)

Bîst/bîstkê: kurt (demake kurt) (kısa bir süre)

Bîzokî: kerihî, îkrah kirin/germxwaz, neşmî (tiksinen, usanç getiren)

Boydax: têkûz (tek başına, hiçbir şeysiz)

Bûzmeçik: nîrkutik (yeni doğan aknesi)

C

Cêc kirin: serad kirin (kalburlamak)

Cîlê: di gavê de, demedem (hemen)

Cirfandin: ricifîn, lertzandin (titremek)

Cirî: qumaniye, zewade (azık; sürü sahiplerinin dönüşümlü olarak çobanın yemeğini üstlenmesi)

Cunî bûn: tirsîn (korkmak)

Cuwe/Cube: bizina nû hatî çipilandin (yeni kırılmış keçi)

Ç

Çakar/Çequer: şîrkiyê tarî (koyu eflatun)

Çar: weba (veba hastalığı)

Çarpê çûn: li ser lepan çûn, gagolekî çûn (emeklemek)

Çavkirin 1): tişte jêhêvîkirî û jêhêvînekirî (beklenen, beklenmedik)

Çavkirin 2): payîn, li hêviyê man, li bendê man (bekleme, beklemek)

Çav qirkirin: Çav neqandin (göz kırpmak)

Çelpirtik: kîper, roviyên zirav (ince bağırsak)

Çeqelme/Çeqleme: dew (ayran)

Çexbe/Çexbûn: vegeîrîn, doş bûn, çerixîn, zivirîn, alîn (dön, dönmek)

Çinti/Çintî/Xonte: şalwar (şalvar)

Çing: çawa, çilo, çito, çer (nasıl)

Çinî/Çenî: tîke (bir parça/bir parça et)

Çirî: hawar û gazîn (feryat ve imdat)

Çî te ketiyê: ji te re çîye (sana ne)

Çîksayî: şeva ku ezman bê ewr e (gökyüzünün bulutsuz olduğu gece)

Çîn/Çînevîz 1): pîrsgirêk (sorun, problem, mesele)

Çîn 2): nexş (nakış)

Çitlixê Şîrîn: kasnî, talîşk (hindiba)

Çolerûn/Çolîk: penêrê rûn tev lê (yağ ve peynir karışımı kır/çöl yemeği)

Çortan: çirik, pilûsk (oluk)

Çuçîke şevê: şevrevînk, şevşevik (yarasa)

D

Damîş dan: beyîtin, xwe ragirtin, li ber xwe dan (dayanmak)

Danandin: dabînantin (dikmek; ağaç, bitki, direk v.s)

Dangkirin: tev hev bûne berx û mîhen/berx berdene mîhen (emmek için kuzuların topluca koyunlara/annelerine katımı)

Darmeşk: mirovê sist, himbil, laşgiran (gevşek ve hantal kişi)

Dastendin: Sekinîn, pan (durmak, beklemek)

Debax birandin: bêzar kirin, tadayî kirin, ecizandin (usandırmak, yıldırım, canından bezdirmek)

Dev beş kirin: ken, kenê bê xem (gamsız gülüş, hiç bir şey umursamadan gülmek)

Dev devî: ber bi (ji bo dem) (o vakite doğru)
Dev sist/Devjê: lewçe, devtejî (boşboğaz)
Devûlev gûvaştin: dev çemandin, xar kirin (ağzını bükme)
Dew: dewê meşkê (yayık ayranı)
Dezî dil qatî: ziravikê xwe bizdî (ödü koştu)
Dêlme: êlek, çekbend (yelek)
Didan feliqî: diran weşî (dişsiz, diş düşmüş)
Dîlik: hûçk (yöresel kıyafetin uzun arkadan bağlanan kol kısmı)
Dîşace: girêj û pas, zerahî, girêjî (kir pas, sararmış, kirli)
Dore din re: dorti ra rojê (ertesi gün)
Dot: pûm, bûm (baykuş)
Dox: tîr (oklava)
Dûgan: gam, moşen (düven, döven)
Dul: zaro, çêl (çocuk, yavru)
Dupi: firtine, bahoz (fırtına)
Dun: don (iç yağı, kuyruk yağı, makine yağı)
Dûmişkir: dûpişik (örümcek)

E

Efsinik: qetrane rwîn (sıvı katran; hayvanlarda kurtlanmaya karşı kullanılır)
Eşohret: hetikandin (rezil etmek, küçük düşürmek)
Erfonek: (yiyecek birşeyin ağızda kolay eriyen kısmı)
Eznî: şîndar, bi şîn, reşgirêdayî (yaslı)

Ê

Êf 1) bw (Bi êf e/i): qedr, qîmet, heja (kıymet, değerli biri)
Êf 2) bw (Êfa xwe jê heyna/helna): tola xwe girt (öç/öcünü aldı)
Êvîsandin/Êvîsîn: hîn kirin, hîn bûn (öğretmek, öğrenmek)
Êvşandin: hêvîşandin, gûrez, bi îdare (kayıрма, sakınma, tutumlu)

F

Feq û fecûr: sereta, qeyde, orf û adet (kural, kaide, örf adet)
Fîlik: tiştên ji pirçê ji bo xemilandine çedibin (kıldan yapılan süs)

Firî/Firuh: firo (ağız)

Fîrusk: fitik, fikan (ıslık)

Fîrusk lê xistin: fituk lê xistin, fikandin (ıslık çalmak)

G

Gelt: kîlim (kilim)

Gerbûn: ketin (düşmek)

Gilî/qotik: porg (kist, şiş)

Gîsk: kar, gidîk (keçi yavrusu)

Givrik: maya pênêr (peynir mayası)

Gog: girig (hamur bezesi)

Gom: evêz, bêrî, gov (ahıl)

Gozal: moxil, hêring, bêjing (kalbur)

Guhdarî/Guhdarî kirin: benda man (birini, bir şeyi beklemek)

Gumurdaq: cûrekî zengil (bir çan çeşidi)

Gurê kirin: guh dan, gotinan kirin (kulak asmak, söz dinlemek)

Gurmik: hesû, heşû (vatka)

Gûzlek (Gwîzlek): Berxe virnî, berxe berdem çêbûyî (doğum zamanından önce, erken doğan kuzu)

Gwoz: çavî, Ode, hucre (oda, göz)

H

Habûb: gûmik (parmak ucu, ucun yumuşak kısmı)

Halaç xistin: herî ji bo paqîji li mekîne xistin (yünün makineyle temizlenme işlemi)

Halpugî: nexweşîya pişika heywanan (hayvanların ciğerinde oluşan bir tür hastalık)

Hefkin: ardê nanê sêlê (ekmek yapılırken kullanılan un)

Heftar: cinawirê efsanewî (masalardaki efsanevi canavar)

Hekat: rewş, mesele (durum, mesele)

Helebî: bêrîvan, navlêkirina ji bo jin û mêrên ku pêz baş didotin (iyi sağıcı)

Hemerî: mest (mest olmak)

Hen: hinek/kesek (birileri)

Heqîp 1): heybe

Heqîp 2): bangname (dügün hediyesi, takısı)

Heri şikinîn: herî şeripandin (açma/gevşetme amacıyla yünü sopa/tahta ile dövme/vurma)

Heşarî xwe bû: ji xwe hesî, bi xwe hat (kendine gelmek)

Hevşa/hevşî: hewş (ağıl)

Hewayê bongî: hewayê girtî, tarî (hava bulutlu, kapalı)

Heyam xweşe: hewa xweşe, bedew (hava güzel)

Heynan: hilgirtin (almak, kaldırmak)

Hêykirin: avêtin, derew avêtin (Atma, yalan söyleme)

Hîlpegî: werem, jana zirav (verem)

Hinav: organên hundir (iç organlar)

Hûnijîn: hênijîn, pîrijîn (uyuklama, uykuya dalma)

Huzb/Huzbe: kîn ajotin, rik kirin (kin gütmek, inatlaşmak, ayak direktmek)

I

Imayî: korî (kör)

Imayî bûn: konebûnî (körlük)

Î

Îzbend kirin: veqatandine bizin û kavirên jar an jî çê (zayıfları ayırmak, ayıklamak)

J

Jêva: bêhat (ona öyle geldi)

Ji ênga de ket: ji hal ketin (elden ayaktan düşmek)

Ji min ber ê: min wîsa hesaband, zan kir (ben öyle zannettim)

Ji xwe ve: qestî, qestî me (sözde)

Ji xwe xweşe: rind, nazenin, bikok (güzel, alımlı, süslü)

K

Karbeşk: şekirok (topuz otu)

Kareşî: cilşo (çamaşırıcı, çamaşır yıkayan)

Katkirin: gotin, bêjitin (söylemek)
Kêlگیر: bitir, pozbilind (kibirli, havalı)
Kêm bibe: wê de, biqêşite, hilbe ji vir (defol)
Kêmbedel: erzan (ucuz)
Kêmî: caris, çêr, kufr (küfür)
Kêmî kirin: carisî kirin, çêr kirin (küfür etmek)
Kenk: êş/êşe marîpişt (omurilik ağrısı, fitik)
Kêşk/kêşkê hev in: mîhên ji dayikê çêbûnî (aynı anneden doğan koyunlar)
Kevrê xiştan: kevrê hûr (ufak taş)
Kewjîn/Pez dikewije: di germê de bêhilmayîna pez û ricifina laşê wan (aşırı sıcakta koyunların nefes nefese kalması ve bedenlerinin titremesi)
Kezî: bêkar, bêjin, bêmer (bekar)
Kirik: sîpe (sıpa)
Kix: loda pisî pêz û bizina (koyun/keçi pisliğinden oluşan yığın)
Koptîşan: hermî piçûk (armut)
Kûçikê deliqî: kûçikê zayî (dogurmuş köpek)
Kûçik hatin min: se bi min da hewtiyan (köpekler saldırdı)
Kule xerab: qansêr, gireba (kanser)
Kulfet: malbat (çekirdek aile)
Kulke: grova herî (yün artığı, dipte kalan kirli kısım)
Kumîn: kifkarik (trüffel)
Kurik: zarok (çocuk)
Kurikbûn: zaroktî (çocukluk)
Kuz: şerbik (su testisi)
Kûşkûr: keşkûr (tezek, kuruyan hayvan mayısı)

L

Lapçîn: botên ji çerm pozên xwe wekî laçîn çetikirinî. (bot)
Lêbam: li ba min (bana göre)
Lêblam/Lebalam: feqet, bi ya min (fakat, ama, kanımca)
Lêdan: kurtûpist, galecî (dedikodu)
Lêm: bîo, kêm, nêm (irin)
Lepsî/Lepisî: çilmisîn (pörsümecek)

Li xofa min çû: ecêb dîtin (tuhaf geldi, tuhafıma gitti).
Li şîv xwin: bi hev re şîv xwerin (birlikte yemek yemek)
Li stû niştin: êrîş, rabezîn (tecavüz etmek)
Loma: lewma (dolayısıyla, ötürü, onun için, zira)
Lorşîrîk: penêrê ji şîrê veşartî/qetî çedibê (kesilmiş süttten yapılan lor peyniri)
Lût bûn: gindirîn, gilor bûn (yuvarlanmak)

M

Mabine: eyvan (evin salonu)
Mala xwe avakir: kêf kirin, şahî kirin (keyf etmek)
Mangê bi arone: çêleka stewr (buzağı büyümüş 7-12 aylık olmuş, sütü katılmış inek)
Marşav: simkot (maşrapa)
Mazman: pezê qert û xesandî (kartlaşmış, iğdiş edilmiş erkek koyun)
Mêjîn/Mîtin: mijîn, mêhtin (emmek)
Meres: sol (ayakkabı)
Meram: gumanî, mimkûn, xalîba (muhtemel, galiba)
Merimal: xizm, lêzim, eqrebe (hısım, akraba)
Milheze: ketin xeman/endîşe kirin (kaygılanmak/endişelenmek)
Miltezîr: dema Osmanîyan de yê ku bac behav dikir (vergi toplayan)
Mîrîstan: egzama, êzimx (egzama)
Mirûz tahlkirin: rû tirşkirin, mirûz kirin (surat asmak)
Mişkê Kwir: mişkî kêlge (tarla faresi, köstebek)
Mit/Mot: dims (pekmez)
Mizêz: mimizokî, ne razî (razı olmayan)
Mutemîn: dadîsten (savcı)

N

Nan lexistin: nan patin, çekirin (ekmek yapmak)
Navêşî bûn/Bi xwine ketin: îshal, virik, amel (ishal)
Naxir: dewar (büyük baş, inek sürüsü)
Naxir ajitin: dewar girtin (inek gütmek)
Neçe 1): bed, çirkin, kereh, tal (çirkin)

Neçê 2): kötû, fena, değersiz, naçiz.
Nefsamir: çavtêr, kesên bi nefsa xwe karîn
Neqep: gimt, girik (tepe)
Neysiz: wajbawerî, şevreşk (doğa üstü güçler, hayalet)
Niqisîn: fik bûn, velîstin (burkulma)
Nistî: bawerîyên tew/batil (batıl inanç)
Nivranî: nebîranî (aşermek, aş yermek)
Niza: pirsgirêk (problem yaratma)
Nugin: nogin (düve)

O

Odaya Sêr/Ser: odaya malnivînk/siyer (yükçük odası)
Oqinti/Oxinti: bangname. (dügünlerde hediye gelen takı)
Opse: hêrg, şûv (nadas)
Om: giranî (ağırılık, ağırılık çökmesi)
Ome kê xwe da ser min/ ome xewê da ser min: giranî kê da ser min, giranî xewê pê girt (üstüme bir ağırılık çöktü, beni uyku bastı)
Oz: dol, dolik, best (dere, küçük dere)

P

Pali/Palî: kesen ji bo palûte ten alikariyê (imeceye katılanlar)
Payî/Payî bûn: şiyar/ şiyarî, hîşyarî (uyanık/uykudan uyanmak)
pêçikê: gavek (kisa bir süre, azıcık)
Pêlva: virda da (ji duh vir da) (dan beri)
Pişkul: kixê, eyê pêz û bizina (dışkı, küçük yuvarlak koyun/keçi dışkısı)
Pît bûn 1): pît (güçlü, kuvvetli, dayanıklı, sağlam, berk, mazbut, sıkı, dinç)
Pît/Pît bûn 2): lezgîn, bihêz bûn (hızlı olmak)
Pûng: nane, tihtavik, pûjan (nane)
Pûr: xalî bi kilsîn (kireçli toprak)

Q

Qaîle kişandin: endîşe kirin (endişelemek)
Qableme: wisa pir, hine, bêbîr (öylesine bilinç dışı)

Qalî bûn: ecibandin (beğenmek)
Qê/Qey: her hal (herhal, sanki)
Qelvandin 1): rastî hev hatin (karşılaşmak)
Qelvandin 2): tevlihev kirin (birbirine karıştırmak)
Qelvandin 3): li hev ketin, li hev qelibîn (çarpışmak)
Qelav: dewlemend (zengin)
Qeremet/Qêwet: iftira, buhtan (iftira)
Qeyd û qomat: amadeyî, tedarîk (hazırlamak)
Qinev: çûreyeke bend, ta (sıtma)
Qiran: perok, şoba (salgın)
Qirmit: dermankarî (pansuman)
Qirnaş: qirnî (kene, koyun kenesi)
Qiw: kêf xwastin (keyfinin, canının istemesi)
Qizik: heramsîker, lîstik xirok (oyun bozma)
Qizik kirin: heramsî kirin, peşk lê xistin (oyunbozanlık etmek)
Qoç kirin: qoçandin (yeni doğan kuzu veya buzağıyı insan eliyle emzirme)
Qolît: hewşe berx û karan (üstü kamış, hasır, çalı-çırpiyla örtülü kuzu ve oğlak ahılı)
Qonc: şan, milpîl (omuz)
Qotik 1): bîhtengî, tengasî, derd (dert, sıkıntı)
Qotik 2): nexweşî xerab (kıran, ölet, kırgın)
Qozî: durum, qot, balîloçk (dürüm)
Qulunç: das, kasok, şalok (orak)
Qurk/Qurqe: kurt (kuluçka)
Qusis: yê ku mûye pêz dibire, pezbir (koyun kırpan)

R

Raserdan: qewirandin, hatin fetilandin (kovalamak, kovalanmak)
Rucû: hêvî (umud etmek, birşeyler beklemek)
Rusûm: kevneşopî, tore (gelenek görenek)
Ro: roj, ro, lehî (gündüz, gün, sel)

S

Safilcan: zatûre (zatûre)

Sebê/Sewa: ji bo (için,... o için)

Senc: kom bûn, li hev gihiştin (toplanmak)

Serçin: penîrê teze, jajî (taze peynir)

Sîlka: sing (kazık)

Sîngselek: qertel (kartal)

Sipîk: avaspî (gözde beyaz su hastalığı, leukema)

Stam: perok (salgın)

Stû herrin: histu direj (uzun boyunlu)

Surî: sûcdarî, sitem (suçlama, sitem)

Sûhva hatin: xeyîdîn, sih/suh ketin (küsmek)

Ş

Şare: zêmarbêj (ağıt yakan)

Şehîn: şihîn (kişnemek)

Şek (dilê kê xwe şek girti): evîna giran (kara sevda)

Şelmaq: sîle, şeqam (tokat)

Şelmaq kirin/lê xistin: sîle kirin, şeqam lê dan. (tokatlamak)

Şêling: şelî, şêlo/şelî bûn (bulanık)

Şelpeze: tepişkor, seqet, qop, qot, kûd (sakar, sakat)

Şeqebişeqeyî bûn: şeqitî (parça-parça, bölük-bölük olup dağılmak)

Şerbet vexwarin: nişan kirin (nişan yapmak, nişanlanmak)

Şikin: bişku, pişku, gulpik (darê şikin dayê) (ağaçın tomurcuklanması)

Şijing: havlêk, gezik (süpürge)

Şîp: deqîq û jîr (işini hızlı yapan becerikli,aceleci)

Şîrê zêç/axin: şîrezak (hayvanların doğum sonrası ilk süt)

Şorsist/devsist: pê zimanê xwe nekarin (ağzı gevşek)

Şukirin: şıyan, kanîn, şekirin (yapabilme, becerebilme)


Sûjî: jajî (peynir suyu)

Çend başî û şaşiyên

Rêbera Rastnivîsînê

Komxebata Kurmanciyê

Amed Tîgrîs



Ev çend sal in ku Weqfa Mezopotamyayê li bajarê Amedê hatiye damezrandin. Di nav xebat û projeyên weqfê de *Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmanciyê* jî hebû. Ji mêj ve ye ku endamên koma xebatê li ser *Rêbera Rastnivîsînê* ya Kurmancî dixebitîn. Çend hefte berî niha bi navê “*Rêbera Rastnivîsînê* ya Komxebata Kurmanciyê” berhemeke hêja hat weşandin. Nivîskar û zimanzanên ku di vê Komxebatê de cî girtine ev in:

Bahîz Omer Ehmed, Bahoz Baran, Behrûz Şûcaî, Deham Evdîlfetah, Dîlawer Zeraq, Dilbirîn Evdîla, Evdîlwehab Xalid Mûsa, Malmîsanîj, Mehmûd Lewendî, Mehdî Caferzade, Mehemed Teqewî, Mistefa Aydogan, Mikail Bilbil, Newzad Hirorî, Samî Tan, Şoreşvan Adil, Zana Farqînî, Zulkuf Ergun

Ev berhem encama xebateke kolektîve. Komcivînê di vê berhemê de gelek xalên rastnivîsînîyên ku heta îro aloz û tevlihev pêk dianî, yek bi yek destnîşan û zelal kirine. Ji bo xebateke weha girîng û pîroz ez bixwe destxweşî û pîrozbayê li birêveberî û xebatkarên Weqfa Mezopotamyayê û koma nivîskaran dikim. Min ji bergê pêşî heta bergê paşî bi baldarî berhemê xwend û li ser hizirîm. Bi rastî min ji xebateke weha hez kir û eciband, lê li gorî dîtina min çend şaşî û kêmasî wê jî hene. Heke em bikaribin di medyaya kurdî de, di nav nivîskar, xwendekar û xwendevanên kurdî de, li ser başî, kêmasî û şaşiyên vê

berhemê, gengeşî û analîzên xurt û berfireh bikin, dê ji bo rastnivîsa kurmancî sûd û kelkeke mezin bigehe me hemû nivîskar, xwendekar û xwendevanên kurmancî. Min li gorî zanîn û têgehiştina xwe van kêmasî û şaşiyên jêrîn di vê xebatê de dîtîn.

- Navê zimanan tewandine û li dawîya navan gireka “ê/yê” bi wan ve kirine. Weke nimûne: zimanê kurmancî bûye “zimanê kurmancîyê”, zimanê tirkî bûye “zimanê tirkîyê”, zimanê almanî bûye “zimanê almanîyê,” zimanê erebî bûye “zimanê erebîyê,” zimanê farisî bûye “zimanê farisîyê”, zimanê çînî bûye “zimanê çînîyê”.... Rast e di zimanê kurmancî de tewang heye, lê di demeke dûr û dirêj de, di hinek forman de tewang rabûye.

Ziman jîndar e û her dem xwe nû dike. Xelk li hêsbûna ziman digere, ziman kurt û nû dike. Ev prensip ji bo her zimanî derbas dibe. Carnan ziman weha tê guhertin ku mirov nizane ka orîjînalê wê bêjeyê çi ye û ji ku hatiye. Ango formên kevn dimirin û yên nû xwe ava dikin.

Bi sed salan in ku kurd ji zimanê xwe re kurmancî, ji yê tir-

kan re tirkî, ji yê farisan re farisî, ji yê ereban re erebî gotine û hîn îro jî rojane dibêjin. De rabe di rojekê de di şûna “kurmancî” de bêje “kurmacyê.” Fonetîka kurdî jî xerab dibe.

- Di rûpela 27an di beşa navên bajar û bajarokên Kurdistanê de, du şaşiyên tewangî hene. Hem ji aliyê tewangê û hem jî ji aliyê polîtîk û erdnîgariyê ve şaşiyên mezin in. Yek ji wan şaşiyên gotina “*bakurî*” ye. Ev gotin ji berê ve di nav gel de “*bakur*” e, ne “*bakurî*” ye. Gotina gel e û di nav milyonan de weha tê gotin.

Gelo mafê mirov heye ku ji bo tewanga herêmeke biçûk “*bakur*” bibe “*bakurî*?” Bi tenê li herêma Hekariyê dikare “*bakurî*” were gotin. Dema ez dibêjim herêma Hekariyê, Dihok û derdorê jî dikevin nava vê herêmê. Şaşiya duyem jî terma siyasî û erdnîgariyê ye. Navlêkirina “Kurdistana Bakurî, Kurdistana Başûrî, Kurdistana Rojhilatî û Kurdistana Başûrê Rojavayî” ne rast e.

- Rastiya van herêman Bakurê Kurdistanê, Başûrê Kurdistanê,

Rojhilatê Kurdistanê û Başûrê Rojavayê Kurdistanê ne. Ji ber ku Kurdistan ne çar Kurdistan in, yek Kurdistan e û çar perçeyên wê hene. Her yek perçeyekê Kurdistanê ye.

- Heke ez şaş nebim cara pêşî Qanadê Kurdo gotina “*cînav*” bi kar anî bû. Piştî çend kesên rêzîmannivîs “*cînavê*” kirin “*cînavk*.” Pronav jî ji aliyê Celadet Bedirxan ve hatibû bikaranîn. Di nav pêvajoyeke nivîsîna 60-70 salan de gotina *cînavê* çiyê xwe girt. Gotina *cî* di orîjînalê xwe de “*cih*” e û hatiye kurt kirin. Ji Serhedê heta Amedê weke *cî* bi lêv dikin. Heremên din jî “*cih*” dibêjin. Di van çend salên dawî de hinek nivîskarên jî li gorî devoka xwe “*cînav*” weke “*cihnav*” bi kar anîn.

Ev ne rast e. Yek orîjînalê birêz Qanadê Kurdo divê neyê xerabkirin. Ya duyem, *cînav* hem gotineke kurt e û hem jî di nivîsînê de jî hêsantir û xweştir e. Wek min li jor jî destnîşan kiribû ziman her ku diçe kurt dibe, baştir, xweştir û hêsantir dibe.

- Lêkera hatin di formê *dihên* û a *anîn* jî di formê *înan* de hatine pejrandin. “*tê*” bûye “*dihê*,” di şuna lêkera “*anîn*” de lêkera “*înan*” bi kar anîne.

Li gorê pêşnîyaza komxebatê ji îro bi şûn ve, “*tê xwendin*” dê bibe “*dihê xwendin*”. “*tê gotin*” dê bibe “*dihê gotin*.” “*tê nivîsandin*” dê bibe “*dihê nivîsandin...*” Gelo çî pêwîst dikir ku komxebat biryareke weha bigire?

- Komxebatê bazinedaçekên duyem di rûpela 168an de weha bi sê awayan rêz kirine:

... da, ... ra, ... va

... de, ... re, ... ve

... da, ... ra, ... ve

Bazinedaçek di rastiya xwe de ne du cure ne. Yên rêza yekem û duyem in. ... *da, ... ra, ... va* û ... *de, ... re, ... ve* ne.

Rêza sêyem ango *da, ... ra, ... ve* li hinek herêman tên bikaranîn lê ev formeke tevlîhev e.

Ka bala xwe bidinê sistemeke xwe ya taybet tune. Ya yekem “*da, ra û va*” ne û ya duyem jî “*de, re û ve*” ne. Ya sêyem ango ... *da, ... ra, ... ve* awayeke dersîstemî ye.

Bi salan e ku piraniya nivîskarên kurd awayê “... *de, ... re, ... ve*” pejrandine û bêjmar berhem dane. Sîstema “... *de, ... re, ... ve*” di nivîsa kurmancî de çî girtiye. Bi dîtina min divê awayê sêyem nehatana pêşnîyazkirin.

Li bajarê Giessenê danasîna romana Dr. Fikret Yildiz a bi navê

LI BENDA KESKESORÊ

Zekî Ozmen




Li bajarê Giessenê, Almanyanayê danasîna romana Dr. Fikret Yildiz a bi navê “*Li benda keskesorê*” hat lidarxistin. Nivîskarê pirtûkê li civîna danasînê hem hinek beşên ji romana xwe xwend û hem jî di dawiyê de romana xwe ya ku nû ji

weşanên APECê derketî ji bo beş-daran îmze kir.

Naveroka romana *Li benda keskesorê* ji çîrokeke rasteqînî pêk tê. Qehremanê çîrokê H. Osman Efendî yê kalikê nivîskarê romanê Dr. Fikret Yildiz e ku cihekî taybet





yê wî di nava dîroka malbata wan de heye. Malbat ji gundê Mikaîla yê Polatliya Enqerê ye. Serpêhatî jî ya destpêka salên 1800an û pê de ye. Osman Efendî di ciwaniya xwe de ji gund vediqete û diçe Stenbolê. Li wir jî têkiliya wî hem bi rayedarên dewleta Osmanî û hem jî bi Mewlana Xalid re çêdibe.

Piştî xwendina li medreseyê dibê me. Pê re jî bi keçeke ermenî ya bi navê Asparîk re dizewice. Ew piştî derdora panzdeh salan vedigere gundê xwe û destpêkê hem gundî û hem jî piraniya malbatê wî nas nakin. Ew li gund di nava demê de bi navê xwe mizgeftêkî ava dike û dibe serkêşê eşîra Mikaîla.

Serpêhatiyên di romana *Li benda keskesorê* de berê bi rêzeçîrokên

bi navê “*Siyarê Têrika*” di kovara *Bîrnebûnê* ku kovareke taybet a kurdên Anatoliya Navîn e, hatibûn weşandin. Dr. Fikret Yildiz ev çîrokên ku pê mezin bûbû di vê romanê de kirin yek û van rojan ji Weşanên APECê derket.

Nivîskar Nuh Ateş jî ku keda wî di nivîsandina vê romanê de heye, di destpêka pirtûkê de kurtedanesînek nivîsandiye.

Nivîskarê pirtûkê di şeva danesîna romanê de destnîşan kir ku armanca wî bi vê romanê ew bû ku jiyana eşîra Mikaîla ya wê demê li Polatliya Enqerê raxîne ber çavan û bi vî awayî arşîvekê ji dîrokê re bihêle.

Navê romanê jî xwe dispêrê efsaneyê ku dema keç di bin keskesorê re derbas bibin wê bibin kur û dema kur derbas bibin wê bibin keç. Balkêş e ku ev efsane ji berê ve ne tenê di nava kurdên Anatoliya Navîn de, lê di nava piraniya kurdan de heye û heta roja îro hatiye.

Danesîna pirtûkê êvara 19ê mehê ji aliyê Komela Civata Alman û Kurd li Giessen ve hat birêxistin.

Romana *Li benda keskesorê* ji 148 rûpelan pêk tê û ji weşanên APECê ku li Stockholmê ye derket.

Wêneyên di vê nûçeyê de ji aliyê Zekî Ozmen ve hatine kişandin û ev nivîs jî ji diyarname.com ê hatîye wergirtin.

LI BENDA KESKESORÊ

Perin M. Esmeroglu

Werin em bi hev ra herin nav salên 1820– 1850. Jîyan û adetên kurdên Anatoliya Navîn, bibin mîvan û wan nas bikin. Berî 200 salan li gundê Mikaîla (Polatli) kurd çawa jîyanin, serpêhatiyên wan, orf û adetên wan.

Ew eşîr bûn, li bin kona dijîyan, serokê eşîra wan hebû, navê wî Hecî Biram beg bû. Os lawê wî bû, ji qezayeke ku bi destê dîya wî bibû, lêva wî ya jorê qelişî bû, jêra digotin Osê Sêlêv. Osê bi vê pir diêşîya. Çiqas mezin dibû problema dev û lêva wî jê re dibû astengî, vê astengîyê welê dikir ku ji nav eşîra xwe û heskirîyên xwe dûr diket.

Dilê wî ketibû Hewê, li ji ber lêva xwe ya qelişî, ji şerm û fedîya ti caran xwe nêzî wê nedikir. Hêvîyeka Osê hebû, ger di bin keskesorê re derbas bibûya daxwaza wî ew ê bihata cî. Lê nebû. Osê dîsa sêlêvî ma.

Rojekê konê xwe, malbata xwe, evîna xwe ya ku ji dûrî jê hez dikir li dû xwe hêla û çû tevî karwanê ku diçû Istenbolê bû. Serê sibehê dîya wî ferq kir ku Osê wenda ye. Pir lê gerîyan lê mixabin nedîtin.

Osê li Istenbolê li Dergaha Mewlana Xalid digere. Li Mizgeftê

dibe mîvan û bi alîkarîya melle û xwendekarên dergahê dike. Dest bi xwendinê dike ku berê jî xwendibû û dibe hafîz. Nav û dengê wî belav dibe.

Rojekê Sultan guhdarîya dengê wî dike, xeber jê re dişîne. Tîrsek bi Osê digre, ji ber ku Siltan ji bo du tiştan gazî merivan dike, yan dikuje yan jî mukafat didê.

Ev dibû sebeba herî tiştê ku di jîyana xwe da dixwest, tiştê ku ji keskesorê hêvî kiribû lê nuha Sultan wê bi cih bianîya.

Istanbul bajarekî wisa reng bi reng bû ku, milletên cuda, dîn û ayinên cuda.

Ji xwe ji bo Osê tiştê herî balkêş jinên wan ên ku çarşeva reş li xwe dipêçandin, ew ne wek jinên eşîra wî bûn. Esnaf û dikandar pirañî bajarîyên Istenbolê bûn. Ziman tirkî û osmanî bû.

Li Çarşîya Misirê kurmanc jî hebûn, wan jî karê barkirin û hemalî dikir.

Lêva Osê baş bûbû, ji xwe nav û dengê wî jî belav bûbû. Siltan payeyek da wî û ew kir endamê encumenê muezzînên Serayê.

Osê dixwest bizewice, mala wî hebe. Xeber da melle û jê alîkarî xwest. Dest pê kir ji xwe ra li xanî gerîya. Xanîyek dît û li derî xist, xwedîyê xanî xaçperestek bû. Navê wî Kevork Altunyan bû. Osê hem ji xwe ra xanî kirrî û hem jî evîna dilê xwe dît, Asparîk; keça Kevork Altunyan.

Bi hev ra zewicîn û daweteke bi nav û deng hat çêkirin. Asparîk gava bebik anî, herdu jî mirin. Êdî tu tiştêkî ku Osê li wir bihêle namabû, evîna wî tunebû. Îstenbol jê re bûbû bajarekî xalî, bajarê tenêtiyê. Kêfa wî û maneya jîyana wî ya li vî bajarî nemabû.

Piştî 15 salan vegeerîya nav eşîra xwe. Bihîst ku evîna wî hîn jî nezewiciye û li benda wî ye. Bi hev re zewicîn, zarokên wan çêbûn.

Wekî ku nivîskar jî dibêje, ev pirtûk bi devoka gundê mikaîla hatiye nivîsandin.

Serpêhatiyên eşîran û orf û adetên wan, zarokên wan çi dikin? Bi çi dilîzin, rojên xort û ciwanan çawa derbas dibe, çi karî dikin, jin rojên xwe çawa derbas dikin? Û hîn gelek tiştên din. Her tişt bi awayekî net hatiye nivîsandin.

Konên kurmancan yên havîn û

zivistanê li ku tînan danîn. Mîvan li ku rûdinin. Xwarin û vexwarin bi çi awayî tînan ber mîvanan. Dan û stendina di navbera eşîran de....

Istenbola 200 sal berê, jîyana Sultanên osmanîyan, zimanê tirkî ya wê demê. Jîyana kurmancan, medrese û dergahên wê demê.

Hevdîtin û hevnerskirina keça û xortan û ciwanan berî zewacê. Rehetîya zewaca di navbera musulman û xaçperestan de.

Şev û meyxaneyên Istanbulê.

Bi vegeera navê Osê dibe merivê ku herî pêşî xanî li gundê xwe ava dike. Mizgeftan restore dike.

Paşê diçe Hecê û di vegeerê de ji xwe ra du koleyan tîne. Ev yek ne bi dilê jina wî ye. Navê mêrik diguherîne dike Bîlal, nave keçikê Ataris e, naguhere ji ber ku jina wî ya berê tine bîra wî.

Osê carna bi keçikê ra dimîne. Osê berî mirina xwe kurê xwe wenda dike. Piştî mirina kurê xwe bédengîyek dikeve nav wan. Keçika kole jî dimire. Pishtre Osê, Bîlal jî ew azad dike. Ji bo keçika kole kevirê gorê (kêl) dide çêkirin lê ji tîrsa jina xwe dernaxe holê.

Pirtûkeka têr û tije, zimanekî cuda û naverokeka pir xweş.

Kitêbên kurdî yên dersê ji weşanxaneyê Apecê



Weşanxaneyê APECê

<http://apecpublishing.com>



Selahaddinê Eyyûbî ji fîrca Nuh Ates

<http://birnebun.eu>